

# BERBANG

KOVARA FEDERASYONA KOMELEN KURDISTANÊ LI SWED



BERBANG

Kurdisk tidskrift, utges av Kurdiska Riksförbundet. Ansvarig utgivare och Redaktör: A. Tigris Layout och sättning : Cotkar och Gundı.

ADRESS

Kurdiska Riksförbundet Rissneled  
ed 55, NB  
172 44 Sundbyberg/ Sweden

Prenumeration: Medlemmar 50 kr.  
/ år övriga 100 kr/ år  
Postgiro: 643880-8

BERPİRSİYAR :

A. TİGRİS

REDAKSIYON :

BAVÊ NAZÊ

S. QERECDAX

C. ŞERO

BRÎNDAR

A D İ L D U R A N

PERGALA RÜPELAN

COTKAR Ü GUNDÎ

BERBANG

Kovara kurdi, xwedi: Federasyona  
Komelên Kurdistanê li Swêdê  
Biha: 5 kronê swêdê  
Abone: sal 50 kron

NAVNIŞAN

Berbang, Rissneleden 55 NB  
172 44 Sundbyberg/ Sweden  
Postgiro: 64 38 80-8

Författares Bokmaskin, Stockholm 1986

naverok

1 — RAPORA KOMİSYONE	3-4
	Komita Koordine
2 — DAXUYANIYA FEDERASYONE	5
	Federasyon
3 — DOSTANIYA TARİ Ü RONİ	6-7
	C. Şero
4 — KONGRA ÇIL ZIMAN	8-9-10
	J. REXNEGIR
5 — ŞOREŞA OKTOBIRÊ	10-11
	S. QERECDAX
6 — HESEN HIŞYAR Jî KOÇ KIR	12-13
	M. Ferzende Baran
7 — JINA LEHENG	14-15
	Lokman Polat
8 — REWŞ Ü TEKOŞINA İ. BEŞİKÇİ	16-17
	Sefik Dundar
9 — WESYETNAMA MELE HESEN HIŞYAR	18-19
10 — ÇEND NAME Ü PİROZNAME	20-21
11 — JI " MÎRKUT " RE MÎKUTEK	22
12 — MIN HİN XATIR JI WELAT NE XWESTIYE	22
	Sero İbo
13 — MIZGINIYEK	23

# RAPORA KOMİSYONÊ

*DI CİVİNA KOMİTA NÜNERAN DE BİRYARA  
AVAKIRINA KOMELEN LI BELEDİYAN HAT PEJRANDIN*

*LI SER BANGA KOMİTA KOORDİNE, DI ROJA 09. 11. 1985 AN DE LI BAJARÊ STOCKHOLMÊ LI XANIYÊ ABF KOMİTA KARGER A FEDERASYONA KOMELEN KURDISTANÊ LI SWËDÊ, KOMİTA NÜNEREN KOMELEN ENDAMÊN FEDERASYONÊ, KOMİTA KOORDİNE BI XWE, NÜNEREN HINEK KOMELE Û KOMİTEYEN NÜ Û HINEK KESÊN MÊVAN BEŞDARÊ CİVİNÊ BÛN.*

*WEK TÊ BÎRA XWENDEVANEN ME, KONGRA FEDERASYONÊ YA AWERTE, BİRYARA AVAKIRINA KOMELEN LI BELEDİYAN DA BÛ. JI BO PÊKANINA KOMELEN LI BELEDİYAN KONGRÊ, JI BIL KOMİTA KARGER A FEDERASYONÊ, KOMİTEKE KOORDİNE HILBIJARTIBÛ. KONGRÊ, KARÜBARÊN AVAKIRINA KOMELEN LI BELEDİYAN DA BÛ WÊ KOMİTA HA. LI GOR BİRYARA KONGRÊ, KOMİTA KOORDİNE, DÊ XEBATA XWE DI DU (2) GEHİNEKAN DE PÊK BANIYA KOMİTA KOORDİNE, DÊ DI GEHİNEKA YEKEMİN DE JI BO AVAKIRINA KOMELEN LI BELEDİYAN LÊKOLIN – LÊGERIN ÇÊBİKIRA. EV XEBATA KOMİTA KOORDİNE DÊ 4 MEH BAJOTA. PIŞTİ 4 ÇAR MEHAN DÊ KOMİTA KOORDİNE, DIVÊ DI DERHEQÊ VÊ LÊKOLIN-LÊGERİNA HA DE RAPOREK RABERÊ KOMİTA NÜNERAN Û YA KARGER A FEDERASYONÊ BIKIRA. LI GOR BİRYARA KONGRA AWERTE, DIVÊ RAPORA KOMİTA KOORDİNE JI BO AVAKIRINA KOMELEN LI BELEDİYAN POZİTİF BE. PÊWIST E, KU BI KÊMASI LI 7 BELEDİYAN MERCEN AVAKIRINA KOMELEN BELEDİYAN HEBIN. LI GOR RAPORA KOMİTA KOORDİNE GER MERCEN AVAKIRINA KOMELEN LI BELEDİYAN TUNE BE AN Jİ JAR BE, PÊWIST E, KU KOMİTA KOORDİNE XWE DI CİVİNA NÜNERAN DE BELAV BIKE. DÊ EW ÇAX FEDERASYON LI GOR SİSTEMA BERÊ BÊT DOMANDIN. EV CİVİNA HA JI BO VÊ YEKE BÛ. ÇAR MEHËN KOMİTA KOORDİNE TIJE BIBÛ Û DIVÊ BİRYARA KONGRÊ BI CI BIHATA.*

*DI VÊ CİVİNA HA YA GIRİNG DE KOMİTA KOORDİNE, RAPORA XWE YA XEBATÊ PÊŞKESİ KOMİTA NÜNERAN Û YA FEDERASYONÊ KIR. RAPORA KOMİTE YA XEBATÊ GELEK POZİTİF BÛ. JI DERÈ NÜNEREN KOM-KAR LI SWËD, HEMÛ NÜNEREN KOMELEN DIN YËN ENDAM RAPORA KOMİTA KOORDİNE POZİTİF DITIN Û LI GEL BİRYARA KONGRÊ YA KUDI DERHEQÊ AVAKIRINA KOMELEN KU LI BELEDİYAN BEN PÊK ANİN DE DENGËN XWE DAN. U HERWIHA BİRYARA AVAKIRINA KOMELEN LI BELEDİYAN JI TEORİYÊ DERBASI PRATIGE BÛ.*

*KOMİTA KOORDİNE JI BO KOMELEN LI BELEDİYAN TESLEXA DESTÜREKE PÊŞKESİ CİVİNÊ KIR. LI SER DESTÜRÊ RABERIZIN HAT KIRIN. NÜNEREN KOMELAN Û BEŞDARVANAN LI SER DESTÜRÊ DİTİNEN XWE DİYAR KIRIN Û PÊŞNIYARIYËN XWE GOTIN.*

*KOMİTA KOORDİNE LI GOR BİRYARA KONGRA AWERTE DEST BI XEBATA XWE YA GEHİNEKA DUYEMİN KIR. JI VIR ŞÛN VE DÊ KOMİTA KOORDİNE, JI BO AVAKIRINA KOMELEN LI BELEDİYAN CİVİNAN PÊK BİNE Û KOMİTEYEN AMEDEKAR LI DAR BİXE Û DEST BI KARÜBARÊN KONGRA KOMELEN LI BELEDİYAN BIKE. HETA MEHA SİBATE 1986 AN PÊWIST E, BI KÊMASI LI 7 BELEDİYAN KOMELE BEN AVAKIRIN. Ü EV KOMELEN LI BELEDİYAN BI NÜNEREN XWE VE BEŞDARÊ KONGA FEDERASYONÊ BİBİN. KOMİTA KOORDİNE JI NIHA VE DEST BI CİVİN Û XEBATA AVAKIRINA KOMELEN LI BELEDİYAN KİRYE.*

*EW RAPORA KU KOMİTA KOORDİNE JI BO AVAKIRINA KOMELEN LI BELEDİYAN PÊK ANI BÛ Û RABERÊ KOMİTA NÜNERAN Û YA FEDERASYONÊ KIR BÛ, EM LI JÊR RABERÊ WE XWENDEVANAN Jİ DIKIN.*

Federasyona Komelêñ Kurdistanê Li Swêd di kongra xwe a awertade 15.16.6.1985, bîryar girt, wekî rëexistiniya Federasyonê a nû bigûhêre û di belediyên ku kurd têde dijîn, komelêñ kurda awa bike ji bo bingehiya Federasyonê. Ji bo ve karê jî komisyonêk ji penc (5) kesan hate hilbijartîn. Divabû Komisyon bîryara Federasyonê a jêrîn bi cî bîne..

## BİRYAR

1. Komisyon ji pênc (5) kesan pêktê.
2. Komisyon ji bo Federasyonê û ji bo

komeleñ belediyan destürê hazir dike.  
 3. Komisyon pişti çar (4) mehan raporekî pêşkESİ Komîta Kargêr û Komîta nüneren dike. Pişti wê civinê di nav çar mehanda (hetan meha Sibatê) avakirina komelêñ belediyan çêkirina kongrê wan û endambûna wan ya Federasyonê diçde. Kongra Federasyonê ya salewexti di dawiya meha Sibatê tê çêkirin.  
 4. Kongre bi van endamêñ vê kongrê ya ıstisnaî vedibe. Li pişti vebûna kongrê, domandina kongrê devri nuneren

endamêñ komelêñ belediyan dibe.

5. Ew nüneren iro endamêñ vê kongra ıstisnaî, dikarin bibin nüneren komelêñ belediyan jî û di kongra Federasyonêde besdar bibin. Bes pişti endambûna komelêñ belediyan, nûnertiya wan û endametiya komela wan yên kevn otomatikmen dikeve.

6. Ji bona ku Federasyon derbasî sistêma belediyan bibe, divê bi kemasî li heft (7) belediyan komele bêne avakirin. Dema avakirina komelêñ belediyan bi sernekeve, domandina xebata

wan yan ji belavkirina Komisynê, bîyar di civîna Komîta Kargêr û Komîta Nûnerande tê girtin.

Piştî hilbijartina Komisyonê, em endamên Komisyonê civîyan û me programma xwe a xebatê çêkir û dest bi karê xwe kir.

Di destpêka karê xwede me civinêk bi Federasyona Yewnanire çêkir, ji bo ku karibin ji tecrubêwan istifade bikin. Piştî civîna bi Federasyona Yewnanire, me ew prensibêwan tasvip kir û ji xwera kir prensib.

-Yek belediye, yek komele. (Belediya Stockholmê istisna)

-Yek kes, endameti di komelekide ku endamê Federasyonêye.

-Di her komelekide seksiyonek ji bo jinan û seksiyonek ji bo ciwanan.

-Di her komelekide û di Federasyonêde komitên xebatê ji bo karên curecure, wekî komîta çandî, komisyonâ multecîyan û hwd.

-Ger di komelekide problêm derkeve, Federasyon li wê komelêde civineki bi endamên komelêre pêktîne û ji bo hal-kirina problêmê biryar digre.

Piştî civîna bi Federasyona Yewnanire xebata me gora xalêñ jîrîn dom-kir.

#### 1- Civîn li Uppsala :

Civîna me yekemîn li Uppsala çêbû. Li Uppsala du komele hebûn. Komîta piştigiriya Gelê Kurd û Gelê Tirk û Komela Democratîn Kurd. Me herbû komele ji gazî civînekî kir û derbarê biryar û xabata Komisyonê civîn agahdar kir herdû komalan ji ditinê xwe bi awakî positîv nîşan dan û dawî civîn biryar girtin wekî herdû komele bêñ cem hev û komisyonekî saz bikin bo yekbûna herdû komelan. Piştî Civîna me, herdû komelan bi belavokekî diyar kirin wekî hatine cem hev, biryara yekbûne girtinne û ji bo karê Federasyonê amedene.

Li Uppsala ji hazari(1000) bêtir kurd dijîn. Endamên herdû komelan bi hevre ji sedi (100) bêtirin.

#### 2- Civîn li belediya Järfalla:

Li Belediya Järfalla komeleke nû sazbû bû. Me bi komîta kargêr komelêre civînek pêk anî. Li Järfalla jimara kurda kîmin, dora deh, panzde malbetine. Dora sîh (30) endamên wekî di kar û barê Federasyonêde amedene.

#### 3- Civîn li belediya Botkyrka

Li belediya Botkyrka berê komelek hebû û endamê Federasyonê bû. Di belediya Botkyrka dora pênsed şesşsed malbatên kurd hene. Dora sed (100) endamên komelê hene. Me bi Komîta Kargêr Komela kurd li Botkyrkare civînek pêk anî. Di civînêde me derbarê biryara Federasyonê informasyon da, hevalen K.K. derbarê karê wan infor-masyon dan me û diyar kirin wekî biryara Federasyonê qebûl dîkin û di kar û barê Federasyonêde amedene.

#### 4- Civîn li Eskilstuna :

Li bajarê Eskilstûna dora sed (100) kurdi dijîn. Li wê bajarê tu komelêن

kurd tuneye. Me, wek komisyon kurden li bajarê Eskilstûna gazî civînekî kir. Di civînêde panzdeh (15) kes besdar bûn. Me civîn derheqê biryara Federasyonê agahdar kir û bersivêñ pir-sen havalan da. Piştî civînê komisyonek ji penc (5) kesan saz bû ji bo karbare sazkarin komelekî. Civînê biryar girt wekî kongra komele ku wê saz bi-be, divê biryar bide derheqê endambûna komelê di Federasyonêde.

#### 5. Civîn li Stockholm :

Li bajarê Stockholm gelek komelên kurd hene. Komisyonâ me ew komelên ku endamê Federasyonêne, gazî civînekî kir û di civînêde derbarê xebata komisyonêde informasyon da. Komelê hemûyan ditina xwe bi awakî positîv diyarkirin û hîn pêşniyar ji dane komisyonê. Dawî civînê biryar hate girtin, wekî di belediya Stockholmêde du(2) komele pêvîstîn. Yek li bakûrê Stockholmê û yek ji li navça Stockholmê. Kurdêñ ku di cenûbê Stockholmê dijîn, divê di komela navça Stockholmêde bibin endam.

#### 6. Civîn li Göteborg :

Li Göteborgê du komelên kurd hene Komela Kulturî Kurd li Göteborg û Komela Kulturî Kurdistan li Göteborg. Komela Kulturî Kurd endamê Federasyonêye. Me herdû komele ji gazi civînekî kir. Di civînêde me derbarî biryara Federasyonê informasyon da û pirsen hevalan besivkir. Di dawiyê civînêde ew biryaren prensibî hatin girtin, wekî her komelek bi endamên xweve civînekî pêkbîne û biryarekî derheqê pêşniyara Federasyonê û yekbûna herdû komalan bigre. Dûra kongra ku wê pêk bê, ji bo endam bûna di Federasyonêde biryar bigre.

Li Göteborgê dora hezarpêncsed (1500) kurd dijîn.

#### 7. Civîn li Belediya Nacka :

Li Belediya Nacka berêde komelek hebû û endamê Federasyonê bû. Lê gelek ji endamên komelê dervê Nacka dijî. Li Nacka dora bist (20) malbatên kurd hene. Me kurdêñ li Nacka gazî civînekî kir. Di civînêde derbarê xebata Komisyonê me informasyon da û pirsen hevalan besivkir. Dawî civînê komisyonek ji sê (3) kesan hate hilbijartin, ji bo amedekirina komelekî nû. Hevalen tevî civînê bûyi ditina xwe li ser pêşniyara Federasyonê bi awakî positîv diyar kirin.

#### 8. Danûstandin bi Karlstadre :

Gora programma me a xebatê, gerek me li Karlstad ji civînek çêbikira. Lê me ew civîn nikari çêbikin. Ji ber ku gava me xwest em biçin Karlstad ji bo civînekî, hevalen li Karlstad nikaribûn di civînêde amede bibin, civînekî wan li Stockholmê hebû. Em bi xwe ji çûbûn Göteborgê.

Komelek berê li Karlstad heye û endamû Federasyonêye. Ewana di danûstandina mede diyarkirin, wekî di rêxistîniya Federasyonê a nû de amedene. Dervayê van bajar û belediyande, ku

me civîn lê çekirin, di gelek belediye û bajarê dinde ji kurd bi jimarêñ mezin dijîn. Lê wextê me çênebû ku em li hemû bajar û belediyan civînan çêbikin. Ev kara wê piştî kongra Federasyonê ji dom bike. Di hin belediyêñ dorali Stockholmêde ji me wek komisyon, sert nedîtin ku em civîna çêbikin û inisiyatîva sazkarina komelan bistin. Me ev kara ji hişte pêşıya me. Civîn bi SIVRE :

Komisyonâ me civînek ji bi Daira Mu-hacirare çêkir. Me D.M. derheqê biryara Federasyonê agahdar kir. Bersiva pirsen wan da. D.M. razîlbûna xwe bi biryara Federasyonê nîşan da û dîyar kir wekî amedene bo alikarî bi her awayî. Me muracatek ji bo vê xebatê wek projekî li cem wan kir. Wana soz dan ku alkariya abori bidin me ji bo meşandina vê projeyê.

Gora biryara Federasyonê diva bû Komisyonê destürek ji bo komelêñ belediyan û yek ji bo Federasyonê hazir bikira. Me ew herdû destûr ji hazir kir û pêşkêsi Komîta Kargêr û Komîta Nûneran dîkin.

#### AGAHDARIYEK LI BELEDİYA STOCKHOLMÊ DU KOMELEN KURD HATIN AVAKIRIN

Di roja 23.11.1985 an de li navendîya bajarê Stockholm û di roja 24.11.1985 an de ji, li taxa Spangayê ji bo avakirina komelêñ li belediyan, du civîn çêbû. Di herdu civînan de ji, gel-er rûnişvanen kurd yêñ ku li wan taxan dijîn besdar bûn. Di civînê de rewsa rûnişvanen wan taxan di çav de hat derbaskirin û di wê babetêde râberizin vebû. Ji bo herdu taxan ji, komiteyên amadekarêñ komelêñ li belediyan hatin hilbijartîn.

Komiteyên amadekar karûbar di nav xwe de beskirin û bernameyên xebatê çêkirin. Komiteyên amadekar di ci de dest bi nîvisandina endaman û endame-tiyê kirin.

Li gor agahdariyan, dê komitêñ amadekar di demeke gelek kurt de nîvisandina endam û endametiya bigîşine armancekê.

Kurdêñ ku di belediyêñ cînarde rû dinin, li kêderê komela kurd tune, divê komela ku nêzîkî belediya wan de bibin endam.

Civîna av akirina 'Komela Kurd li Stockholmê wê di roja 4.1.1986 ade li Brygghuset, Nortullsg 12 T-Odenplande, seet 12.00 çêbibe. Ew kurdêñ ku dixwazin bibin endam, divê heta 29.12.1985'a li cem Komisyonê muracate endametiyê bikin.

Civîna av akirina 'Komela Kurd li Spanga' ji wê di roja 5.1.1986 ade, li Kista Träff seet 12.00'de çêdibe. Ew kesen ku dixwazin bibin endam, dikarin heta roja 29.12.1985'a muracate xwe li cem komisyonê bikin.

Li bajarêñ din ji karûbarêñ avakirina komelêñ li bêlediyan bi şewekî aktif û pozitîf dom dike.

# DAXUYANIYA FEDERASYONÊ

XWENDEVANÊN BIRÊZ !

DÎ ROJA 2.11.1985 ' AN DE LÎ BAJARÊ STOCKHOLMÊ DÎ ŞEVA PAR-TIYEKİ KURD DE KURDEKİ BİNAVÊ ÇETİN GÜNGÖR BÎ ŞEŞDERBÊ HAT KUŞTIN. MËRKUJ JI ALIYÊ POLIS VE HAT GIRTIN. LI SER VË BÜYERA KIRÊT, RAYA GIŞTİYA SWEDÊ KET ELEHIYA KURDAN. BI DEST Û ALIKARIYA HÎN KES Û HÊZEN TARÎ PIRANIYA ROJNAME Û RADYO Û TELEVİZYONA SWEDÎ XWESTIN HEMÛ KURDAN WEK TE-RORİSTAN ŞANIBIDIN. FEDERASYONA KOMELEN KURDISTANÊ, LI SER VË REVŞA NE BAŞ, BI ROJNAMAVAN Û NUÇEHİHANEN SWEDÎ RE CIVİNEK ÇEKIR Û VË NIVİSARA JËRİN BISWEDÎ PÊŞKEŞÎ WAN KIR. ME EW DAXUYANIYA FEDERASYONE WERGERAN KURDİ Û EM PÊŞKE-ŞÎ WE JÎ DIKIN.

Di roja 2 yê meha 11 an 1985'an de li Stockholmê, li Medboryarhuset'ê yek welatiyê me hat kuştin, du kes jî brindar bûn. Pişti vê bûyerê qatil jî ali polis ve hat girtin. Federasyona kurd, derheqê vê bûyerê de vê agahdariyê dike :

Wek agahdariyên rojnamên Swed, li pey vê cinayetê partiya kurd PKK heye. Em wek Federasyon, rastiya van nûçen rojnaman bawer in. Di raya giştî da PKK. wek tekoşina azadiya Kurdistanê tê nişandin. Ev bi tevayı şas e, PKK û kîrinê wê yêner terorê tu car gele Kurdistanê temsil nekiriye, em wek kurdan, jî ali prensib ve bûyerên weha ku bi kêrê dijmînên gelê kurd bê, em mehkûm dikin.

Partiyek ku bi kîrinê xwe xisarê bida doza gelê xwe, nikare gelê xwe temsil bike.

Em wek federasyon, vî bûyerê li dijî çareserkirna mafê gelê kurd, prova-kasyonekî dibînîn.

Em kurdên ku li Swedê ne, baş dîzannîn ku, gelek qewetên tarî, bi zanîn dixwazîn gelê kurd terorist nîşan bîdin. Tenê armanca wan, xüabkirina tê kiliyên baş ku di nav kurdan da û Swêdiyan de hene ne. Wekî din ewana dixwazinku, nêrînên insaneti yêner partiyên Swedî li himber doza kurd sabote(xirab) bikin.

Di demêñ dawî de, qewetên dager yêner Tirk, nexweşîya xwe ya li hember

Kurdên ku li Swedê hinik mafên baş xistine desten xwe, şan dan. Ewana ji hebûna weşanêن kurdî, ji komelan û ji hebûna mekteba mamostayan ya kurdî eciz dibin.

Li gora wan, herkes xwedî û laiqê van mafan e, lê kurd na. Ewana pür caran gotibûn ku, ewê li hember van ìmkanatan û serfiraziyan ku Kurdan bi dest xwe xistne, bi her awayî dê tekoşin bidin.

Wekî din gora rojnamên tîrk, li derê welat yêñ ku li dij Tîrkiyê bixebite, dê li hember wan grubekî bi taybetî bixe-bite. Ji bo vê yekê, em dixwazîn ku tevayı partî û meqamîn resmî, divê li hember van qewetên dager ku şas agahdarî didin û viran dikin, jî wan bawer nekin. Yêñ ku li dij gelê kurd li dij qewetên mixalefetê terora dewletê dixebitînin ew in.

Em ji meqamîn Swed re rica dikin ku, ji xetên agahdariyê yêñ generalen faşist bawer nekin.

Kurd, ji salêñ bo'i vir de li Swedê hebûna. Dî nav vê demêda têkliyên me yêñ destanî bi meqamîn Swed re, bi gel re, bi herekan re (komel û hwd.) bi yek û yek mirovan re çê bû ye bi meselên gelê kurd û bi trajediyêñ wan gelek Swedî ji nêz ve dinase. Dijmin, welatê me zeptkiriye, zimanê me qe-

dexe kiriye, mafên me yêñ netewî û democratik ji destê me standiye. Bo vê sedemê ye ku hinik kurdên siyasi starî vir kiri ne.

Ji nav me ji mirovîn xirav dikarin derkevin, lê kurdan hemû mekin yek mëzinnek. Em, kîrinê terorê û yêñ zorê, ji kî tê bila bê mehkum dikin.

Berî ji, di havina 1984'an de yek welatiyê me li Üppsalayê hatîbû kuştin. Ne em, ne jî raya giştî, di derheqê qatil da û derheqê qewetên pey. wi da agahdariyên rast nestand. Qatil got mi cinsyetê ji bo sarmanca siyasi pêkaniye û wî navê herekeki Xeyali da. Divê tu kes, bi van agahdariyên derew û yêñ ku rê didin şaskîrin nêñ xapandin. Em dixwazîn ku, qewetênu metodê zorê dixebitînin bêñ tesbitkirin û têkevin resmiyeta meqaman, yêñ ku ketine nav van bûyeran û wezîfe standine divê icezê xwe bistinîn. Ji bo rohnikirina her du bûyeran jî, divê bi agahdariyên derew û yêñ ku xetê dixwaze şas bida xwiyakîn û bi agahdariyên dizi ne bes bin, ji bo viya em ji we rica dikin.

# DOSTANIYA TARİ Ü RONİ

C. SERO

## DESTPÊK

Hinek peyv hene, ku merov wana gelek bi kartîne. Di dan û standinê rojê de, di bîrûbaweriyêni siyasi de, di jî yana civakî de li welat û li derveyê welat ûhwed, ev peyvana tim têni bikaranîn. Ne pêwîst e, ku merov zêde li ser wan bi bifikire, lêbikole. Gotin û bi karanîna wan diçe derbas dibe û dibe adet. Merov gelek cara navaroka wan peyvana li gor bawerî û fenteziyêni xwe sekil dide. Tecrûbe û dîtinêni merovan, di ziman de pijandinekî çandî û civakî bi van peyvan ve girê dide. Li gor kesan, grubêni sosyal, li gund û bajar, li civînêni cûrbe cûr ev peyvana navaroka xwe kom dike, bîhev dihesirine, giyedîde, dikuşîne, didirû û pêk tîne. Ewana jî gelek cara dibe problem di dan û standinêni merovan de. Yek peyv kare bê gelek manan, merov hev du dikare baş tênegîne û derbas dibe. Ev problemen ziman û çandî, bi taybetî li welatê wek Kurdistanê gelek zêde ne. Kurdan heta niha imkan nedîtin, ku hevdû bi awekî baş û pir aîsi ve nas bikin. Dewletêni kolonîyalist nahilin, ku em bi zimanê xwe bi peyvin, pirtûkan çap bikin, bi riya radyo, televizyon û rojnaman hevdû jî aliyê çandî û civakî de berbehev bêni û hev nas bikin. Li welatê ku mass-media yanî rojname, radyo, televizyon ûhwed.. pêşketiye problemen wan yên dan û standinê ji aliyê çandî û civakî de ne wilô gelek mezin in. Lê li Kurdistanê ev problemeke gelek mezin e. Ji ber ku zimanê me qedexe ye li ser her cûrî nivîsar nayin nivîsandin, raberizin cênenin. Lê gelên din liser her babet û peyvan bê hejmar nivîsanin û raberizinan vedikin.. Ziman û wêje wilô di nav gel de belav dibe û pêş dilkeve Bêja dostaniyê mînakeke biçük e. Gelên aza li ser vê bêja ha bê hejmar nivîsar û pirtûkan nivîsandine. Semineran û civînan pêk anîne.

## PEYVA DOSTANIYÊ

Wek me li jor jî got dost û dostanî ji wan peyvan in. Merov gelek carî li ser dostaniyê bawerîya xwe dibêje, mînak " Heval Kurdo dostekî gelek baş e. Gelê kurd û gelê x dost in. Dostekî wiha nake! Dost û hevalîn kurdan tunene." ûhwed. Merov kare pirsan zêde û kêm bike. Lê belê merov kare pirs bike " dost kî ye" û " dostanî çî ye? " Em li ser van pirsan hineki serê xwe bêşinin!

Di dîroka felsefe û ramandinê de gelek kes li ser dost û dostaniyê bawerîya xwe gotine, nivîsandine. Filozof û nivîskarê Çinî Konfeciüs ( B. M. 500) li ser danûsatandinê merovan gelek tiş gotibû. Konfeciüs di nav merovan de pênc cûren danûstandinê hene:

- 1) Danûstandin di navbera kral û xulamên wî de yanî dewlet û merov;
- 2) Danûstandinê bav û law;

3) Danûstandinê mér û jîn;

4) Danûstandinê zaro kên mezin û yên biçûk;

5) Danûstandina di navbera dostan de.

Her çar danûstandinê pêşî li ser ne wekheviyê ava di be û tê de jîr û jor heye. Danûstandin li ser bingehekî aza û ji dil nehatîye avakîrin. Dostanî li ser bingehekî wekheviyê û azadiyê ava dibe. Zor têde tune ye.

Nivîskar, filozof û siyasetvanê Romî Marcus Tullius Cicero ( B. M. 106-43) ji li ser dostaniyê nivîsandiye. Li gor Cicero, rûhî dostaniyê, ji daxwaz, bawerî û şewrê ( lihevkirinê) ava dibe. Dostanî dikare di navbera merovîn bas de pêk bê. Di xerabiyê de dostanî tune. Xerabî bi xwe li dij bingehê dostaniyê radiweste. Merovîn xerab bi hev re nikarin dostaniyê pêk bînin. Li gor Cicero, merovîn bas xwedîyê bawerî ne, merd in, hakimê xwe ne, dilsoz in.

Naveroka dost û dostaniyê li ser bingehê rastî û dilsoziyê ava dibe. Bi darê zorê, bi devê tifingan dostanî ava na be. Pir pir koletî ava dibe! Li ser bê gumaniyê, zikreşiyê, sextekarî, derew, fort û zirtan dostanî ava na be. Ciye ku li wir menfaet hene, dostanî tune ye. Cicero dibêje, ku "heger dostanî û menfaet bi hev ve hatine girêdan, bi rabûna menfaetê, dostanî jî , ji navê radibe." ( Li ser Dostaniyê, rûpel 115)

Di danûstandinê dostanî de, serfîrazî her gav ji bo axlaqî baş e. Bê karekterbûn dijminê dostaniyê ye. Ji bo dostanî kûr bibe û bighe, divê merov bi hev re bi tenûran nan bixwe û bi kûzan avê vexwe. Siyasetvan û nivîskarê Romî Marcus Cato ( B. M. 234-149) dibêje , ku "dijmin carna rastiyê dibêjin lê dost qet nabêjin." ( rûpel 159) Pêwîst e, dostekî baş her gav rastiyê bibêje. Ew dostê ku rastiyê ne bêje, ne dostekî rast e. Dostekî bas, ji dostê xwe re her gav na bêje " tu çîgas baş ï! Kesi wek te tune. Tu çîgas hêja ï! Mêrxasekî wek te tune!" ûwd..

Di sarayê Osmanî de gelek helbestvan û nivîskar hebûn, ku wesk û pesnê padîşan didan. Ew danûstandinekî dostanî ne bûn. Lê ew sextekarî û dûrûti bû. Di navbera dostan de divê têkiliyêni wiha tune bin. Dost divê raste-rast rexnan li hev bigrin û hev pêşve bibin. Ji başiyê û pêşveçûne re re ve kin.

## BABETÊN DOSTANIYÊ

Gelek danûstandinê merovanî hene, ku nezîkî dostaniyê ne; lê ne danûstandinê dostaniyê ne. Pîri cara merov dibêje; "filan kes dost e" lê di rastiyê de, em dixwazin bêjin, ku " filan kes merovekî baş e, an nasekî baş e, an ji tekoşerekî baş e" ûhwed..

Profesorê İtali Francesko Alberoni li ser dostaniyê pirtukeke nivîsiye, bi navê "Dostaniyê (Vanskap-1983).

Alberoni, di pirtûka xwe de li ser naveroka dostaniyê bi zimanekî gelek hêsa û pir alî sekiniye. Ew, dibêje, ku "merov gelek cara ji yekî / yeke nas re dibêje dost; lê yekî nas ne dost e. Merov baş dizane ku yekî nas ci difikire, ci daxwaz dike, ci problemen wî hene. Merov dizane ku di navbera me de aliyen şirîkayetiyekî heye; merov aîkarî ji hev dixwaze. Danûstandinê merov gelek baş in; lê belê merov baweriyeke kûr û dirêj bi hev nayîne. Ü merov tişti ku dizane ji hev re na bêje. Merov divê nas û doston ji hev ciyê bike."

Alberoni dibêje, ku "dostanî û hevkari ji ne eyîn tiştin." Di hevkariye de, merov dostê şerê, li dij dijminan hêzê xwe dike yek. Li aîskî dost û li aliyekî ji dijmin hene. Çek ükincen merov wek hev in (leşger, polis, pêşmerge); merovên olperest ji hev re dibêjin; "bira", merovên sosyalist û yêç ji hev re dibêjin; "hevre." Danûstandina merovan bi werisekî qalın bi heve girêdayî ye. Kolektif e ne şexsi ye.

Di karûbarê rojanede têkiliyên pir alî hene, ku li ser rola merovan ava dibe. Wekî şirîkatiya bazirganiye, têkiliyên ciranan û danûstandinê menfaet... Dema menfaet diqede, têkiliyên dostoniye ji ji navê radibe. Gelek merov hene, ku sempatiya wan ji hev re hene, heyranê hev in û ji danûstandinê hev zevk digrin. Ewana ji babeten danûstandina merovahiyê ye, lê belê ne têkiliyên dostoni ne.

Dostoni her gav li ser diyalogan pêktê. Merovên dost hevdû temam dikin, tiştan wek hev an ji nêzi hev dibînin. Ü li dij dijmin bi hev re şer dikin. Merovên hevalen hev yêç çek û nêçîriyê.... Alberoni dibêje, ku "ez ji dosteni hêvi dikim ku min çewt fam ne ke. Kesê din karin min çewt fam bikin, lê belê ne dosteni min. Heger dosteni min, çewt têbigîne dostoni diqede." (rûpel 12)

Dostoni, di rojêni dijwar de gelek xurt e. Dost ev e, ku her gav aîskariya min dike, ku ez pêsta biçim. Armançen min ji bo min zelal dike. Ü bi min re hinek rê dimeşe. Ew deriyê ku ez dixwazim vekim, dostê min vedike û ji danûstandina dosteni ez hergav rastiyekî fêr dibim. Dosteni ne mameste ye; merov mameste hevdû ye. Alberoni dibêje, ku "dostoni wekî paqîjiyê ye, bi henekî lewitandin xerab dibe û naveroka xwe wenda dike. Dostoni, li ser durstiyê, paqîjiyê zelal bûye û ra û şaxen xwe berdaye. Merov gelek cara dibêje, ku 'de ka ji min re bêje dosteni te kî ne; ez dê ji te re bêjim tu kî yi."

Virker hevalen virkeran in, sadîst hevalen sadistan in, diz hevalen dizan in. Evren hevalen Reagan e, kurd perwer hevalen sosyalistan in.... Merov heval û dosteni xwe hildibjere. Di dostoniye de têklîf aza û serbixwe ne. Wekheviye.

## DOSTANIYA DİROKİ

Komikên ilm û teknikî bi hev re xebat dikin û ilm û teknik pêşve dibil. Di xebata xwe ya esasi de gelek nivîskar, ulmzana, senetkar, dost û hevalen hev in. Di hundirew latekî de gelek cara nivîskar û ulmzana dosteni hev in, her çiqas nakokî ji hebe. Di dema antîki de Li Yewnanîstanê, gelek feylelof û nivîskar dosteni hev bûn. Piştgiri û aîskariya hev dikirin. Di dema Ronahiye li Fransa, gelek nivîskar û feylezof disa dosteni hev bûn. Mesela, Voltaire Rousseau Grinin, Diderot ûhw... Li Elmanya di warê felsefe û nivîskariye de wextê ku bi navê Romantîkbûnê hati bûn naskirin; gelek ji wan kesan dosteni hev bûn. Wekî Goethe û Schiller... Gelek dostoni hene, ku tesir li diroka cihanê kirine, di ilm de şoreş çêkirine; di siyaset û dirokê de demen nûjen destpêkirine, wekî Marx û Engels.

Sosyalogên Elman Max Herkheimer û Tevdor Adorne bi xebat xwe ya ilmî gelek lê kolîn, pirtûk û xebatê nûjen pêk anîne. Di diroka ilm de dibistanan destpêkirin.

Marx û Engels cara yekemîn hev dû di sala 1844 an de naskirin.. Marx wê demê 26 û Engels ji 24 salî bû. Di demmekî gelek kurt de hev dû li Kolonî (li Elmanya) û li Parisê (li Fransayê) ditin û dest bi xebatê kirin. Dest bi xebat nivîsandinê, ideolojiya Elman û nivîsandina Manîfestoja Komünîst kirin. Nêzîka 19 salan Engels aîskariya malbata Marx kir, bê ku menfaeta sexsi bifikire. Pişti mirina Marx (1883). Engels xebata wî berdewam kir. Pirtûkan çap kir, banda 3 ya Kapital, pişti mirina MArx temam kir. Xebata Marx û Engels hergav hevdû teman dikir û dostoniye wan her dem xurtir dibû. Kokên xwe davet. Di navbera wan de hesûdî û qayış kişandin tune bû, lê belê dostoniye hebû. Wan diroka cihanê guhart.

## DAWÎ

Wekî gelek tiştên din, dostoni ji, li gor rewşa diroki, aborî û kulturî dikare şiklê xwe biguhrine. Dostoni civatekî primitiv, kapitalist û Sosyalist de ev ne wek hev in. Babeten dostoniye li gor babeten civatê pêşdikeve û dimeşe. Têkiliyên merovan yêç civakî li gor netewan ji têñ guhartin. Dostoniye du kesê swêdî û du kesê kurd di gelek tiştan de ji hev cûda ne. Lê di bingehê xwe de ji wek hev in. Dost dost e, ci li Çinê, ci li Swêdê û ci li Mançinê.... Dijmin ji dijmin e, ci li der û ci li hundir!

## CEND ÇAVKANİ

- 1- Li Ser Dostoniye - M. T. Cicero Stockh-1968
- 2- Dostoni Francesko Alberoni Stockh-1983

## CIVİNEK

Redaksiyona Berbangê, di rojâ 17. 11. 1985 an de li bajare Stockholmê bi hinek nivîskar û hunermendê kurd re civînek pêk anî. Redaksiyona me, ji bo Berbangeke hîn bi qelîte, pêşketî û bi ser û ber, serî li ditin, daxwaz û rexneyen wan kesan xist. Hemû besdarvanê civînê yek bi yek ji bo Berbangeke hîn baştir û hêjatir, daxwaz û rexneyen xwe raberê endamên redaksiyonê kirin. Li ser vê rewşa ha dûr û dirêj munaçeşe vebû. Em bi şêweke kurt û teví ditin, daxwaz û rexneyen wan hevalan pêşkesi we xwendavanan dikin:


Divê berbang demokratik be. Berbang li pêsiya nivîskar û hunermendê kurd pingar û dîwaran çeneke. Her kes bi awekî demokratik karibe ditinê xwe binivîse.

Ji aliyê teknik, naveroka nivîsan û qelîte ve Berbang gelek jar (zeyif) e. Pergala rûpelan nîne. Xêzik, karîkator û fotograf kêm in.

Pêwîst e, redaksiyon pişti her kongreyî neye guhartin. Kongre şefredaktor hilbijere. Kongre ji Berbangê re destûreke xweser çêke. Kesên ku di redaksiyonê de ci bigrin, divê kesê kêrhatî bin. Ji hegê vî karûbarî derkevin. Ev kes divê ji edebiyata kurmancî, soranî û dimili fam bikin. Redaksiyon organike wek meclisa şêwrê pêk bîne. Bi kîmasi di salê de 2 car ev meclis biceve.

Berbang, divê giraniya xwe bide ser meseleyen kurdî. Klasikên kurdî û weşanen nû bide nasandin. Rê ji rexnan re veke. Heyveyînan çêke. Civîn û panelan pêk bîne. Berbang, divê ji bo kirîna teleksekî li hinek ïnkanen nû bigere. ....ûhw...

# KONGRA ÇIL ZIMAN



J. REX NEGIR

Serokê diwanê, mîkrofonê ber bi xwe kîşand, qîrika xwe çêkir û bi ser nûnerên kongrê de bi madekî tîrş û tehl qîriya:

— Delegeyêñ ezîz, divê hûn bi sirê qise bikin. Kesêñ ku dixwazin qise bikin, bila ji kerema xwe, navêñ xwe bidin nîvisandin. Ji bo ku baş bê fam kirin, zorûnliye dîsa em guhdariya hevalêñ konışmacî bikin û ji wan re hurmet şan bidin. Ger xeberdan ûsa kuralsız be, wê berdan berdan dom bike. Em ji nikaribin kongrê bimeşîn!...

Di rêza pêşîn de nûnerek di ciyê xwe de bi dengekî bilind dipeyîviya û nîşka ve rabû piya, heta ku jê hat bi dengekî qalind bi ser serokê diwanê re qîriya:

— Diwan ji serê sibê ve bê nîzamî dike. Ez dixwazim li ser nuxta nîzamî

bisekinim....

Serokê diwanê ji cî hilfîri:

— Keko! tu bi xwe bê nîzamî diki. Fermo rûne û navê xwe binivisîne!

Lê eybe eyb xwedîyê nuxta nîzamî get rûdine! Hîn ji tûre bû:

— Birayê min nuxta nîzamî muhîm e. Tu kes nikare rê li nuxta nîzamî bigre. Ji bo nuxta nîzamî sire mire nîn e. Nuxta nîzamî wek her kes dizane, tiştekî tuzukî ye. Ji ber vê yekê ji diwan mecbûre xeberdana min nexe sirê. Bû çend saet e, ku hûn nikarin kongrê bimeşînin. Çunkî nuxta nîzamî ji kongrê re rê vedike. Ji van sebeban heqê xeberdana min gerekî ye. Heta Zorunî ye.

Serokê diwanê şaş û matmayî ma. Nizanibû çi bike. Bi hevalê diwanê yên din re peyîvi. Diwan gelek dewlemend bû. Diwan ji 5 kesî pêk hati

bû. Her 5 kesen endamên diwanê li dor masa diwanê kom bûn û serê xwe kirin ber hev û dest bi şêwr û mişawirê kirin. Wisa bû, ku êdî kes nikari bû serêñ wan ji nav hev derxe. Bi rastû doz gelek giran xwuya bû ku diwan di derheqê nuxta nîzamî de bi kurdî nikari bû munâqaşe bike û biryara xwe bide. Diwanê dest bi tirkî kiri bû. Ü haya wan ji tune bûn, ku mîqrofon vekirî ye Bi tirkî çîqas munâqaşe sor dibû, hewqas ji deng di mîqrofonan de bilind dibûn. Guhdaran dest bi kenînê kirin.

Xwedîyê nuxta nîzamî rûnedinişt, li piya bû. Li diwanê dinêriya û serê xwe dihejand. Carna ji bi aliyê nûner û mîvanan ve vedigeriya û di bin lêvan de dikeniya. Destê xwe li ba dixist, bi diwanê henek û tinazên xwe dikir. Bi işaretên seri û destan dixwest be-

lengazî û rebeniya dîwanê şanî nûner û mîvanan bide. Ji xwe gelek ewle û bawer bû. Dîwan ji baş dizanibûn, ku ew nûner di nûnerîtiya xwe de bibûre, di nuxta xwe ya nîzamî de nabûre...

Çend deqîqe paşê endamên dîwanê ji der û dora masê belav bûn û her kes li ciyê xwe rûnişt. Serok û çend kesen din xweydana eniya xwe paqîş kîrin. Serokê dîwanê kaxizan li pêş xwe da ser hev û rast kir. Bi ofêneke kûr dest avêt mîqrofonê. Deng ji nûner û mîvanan qet ne dihat. Mirov digot qey salon vîkî vala ye, qet kes nîne. Çav û guhêñ her kesî li serokê dîwanê ziq û miç mabûn. Serokê dîwanê dest bi xwendina biryarekir:

— Fermo birayê min tu karî bipeyvî. Niha em guhdariya nuxta te ya nîzamî dikin. Ez ji te rica dikim, carekî din ji tu me bi nuxta nîzamî mîzamî filan aciz nekî. Ev nuxta te nayêle em kongrê bimeşînin. Fermo nuxta xwe ica bi kurtayî bibêje. Fermo, fermo!..

Weyyy xwedêwo!... Ya ku dîwanê û nûneran dit û bihist gurê serê çolan, gurê manco nebîne û nebhîse!.... Xwediyyê nuxta nîzamî wekî sîlahê otomatik dest bi axaftina xwe kir. Ji avakirina federasyonê bigre, heta demokrasiya komelan, xebatê salêñ borî yêñ pêş, tâhilîla civaka Swêd, destûr û program .....xwediyyê nuxtê her ku dicû lê sor dibû. Carna li dîwanê û carna ji dizivîri li nûner û mîvanan dinêri û hîn ji bi lez û bez axaftina xwe didomandin.

Serok çend cara xwest peyva wî bire, ji ber vê yekê ji, di cî de rabû, rûnişt. Lî, eybe eyb xwediyyê nuxtê bi zor bela fersend dîtibû. Çend nûneran xwe ranegirtin û ji dîwanê re:

— Ev çî ye... ev çî bê usûlî ye. Peyva wî bire! Ka nuxta nîzamî?

İca serok rabû piya û qiriya:

— Kekê min, çavê min ka nuxta te? Tu çi dipeyîvi, tu qala nuxta xwe dikî bike, an ji ez peyva te dibrim.

Lê, xwediyyê nuxtê wekî ku qet deng ne çê wî, axaftina xwe hîn ji bi lez û bi deng domand. Serok ji xwe re dipeyîviya û ew ji ji xwe re. Yekî guhde-riya yê din ne dikir. Nûneran ji di çî yê xwe de dest bi axaftinê kîrin.

Nûnerê Komela kevnare, devê xwe bir ber guhê hevalê xwe û bi tirkî ji hevalê xwe pîrsî:

— Ji bo xwedê ev munaqesa tûj û dirêj di derheqê çi de ye? Em niha di kijan xala rojevê de ne?

Hevalê wî bi tirkîyeke heremî û bi gehr:

— Piçek bîhna xwe fireh bike...

ez nizanim çi bi serê te hatlye. Em li ku rojev li ku... hîn me dest bi rojevê kiriye. Tu nabîni munâqesa li ser rojevê ye!

Nûnerê Komela Kevnare carek li rojevê nihêrî û carek ji li dîwanê... di cî de rabû ser xwe. Pêñûsa xwe bi hişkayı avêt ser masê. Pêñûsa rep û ket erdê. Berê xwe da derhîn ne gîhîst nav deriyê salonê, dest bi kişandina cixara xwe kir. Bi kul û keser dûmanê kişand hundîrê xwe û di hêvîlên xwe de wek dûwa trênen berda der. Hevalêkî wî li salonê pirtûkan difrotin; ev rewşa wî ya ha ya ne baş dît û ber bi widimeşîya wî, xwest ku hinek moral bide ew. Lê hîn nêzîkayı lê nekir bû, ew teqîya:

— Ji me re gotin dê kongrê çend satan bigre, lê iro 4 roj in ku kongredom dike. Wiha be dê hîn 4 roj ji, dom bike. Ji yêñ wek min re cezayekî gelek mezin û giran e. Baweriya te hebe, tam bû 4 roj e, ku min 4 kelîme fam nekir. Ez par 20 meh di girtîgeha Dîyarbekir de bûm; ez bibêjîm, min hewqas ceza nekişand, divê tu bawer biki! Li wê rerê qet ne be mirov bi hev re bi tirkî dipeyve. Li vira ew tune. Iro 4 roj e, ku ez ji serê sibê hetañî êvarê di ciyê xwe de rûdinim. Tê-nagîmîm çi dibêjin, li ser çi munâqesa dikin. Çaxa mirov ziman fam neke gelek zor e. Eşkence ye malneket!

Ü wilô her du bi hev re meşîya hetata ba deriyê der. Hevalê wî serê xwe kiri bû ber xwe û baş duhderiya wî dikir. Destê xwe kir berîka xwe û cixara xwe ya "Gul Blend" derxist. Nûner bi hestê xwe cixara hevalê xwe pêxist. Hevalê wî gulpek li cixara xwe xist û pê re:

— Ma te di seri de çewtî kiriye. Çaxa mirov bi kurdî nîzamibe, divê mirov ne be nûner. Bila hevalêkî kurdî dizanîn bibûya nûner.. Ji ber ku ez nû hatime, rewşê baş nîzamîm. Lê li gor ku em pê dizanîn, komela me, komeleke kevnare û mezin e; divê bi sedan endamên wê hebin. Bila çend kesen din biban nûner... Madem ku rewşa te wişa ye, tu çawa dengê (raya) xwe didî?

— Ci deng ci hal! Ez li hevalan dinêrim; ew destê xwe bilin bikin ez ji bilind dikim. Ew ne kin ez ji nakim.

Nûnerê Komela kevnare, devê xwe bir ber guhê hevalê xwe û bi tirkî ji hevalê xwe pîrsî:

— Hevalê nûner werin hundir, dê dengdan çêbe!

Nûneren ku li derê salonê bûn çûn hundur û li ciyêñ xwe rûniştin. Lê hîj serokê dîwanê bi zor bela axaftina

xwediyyê nuxta nîzamî dabû rawestandin. Yêñ ku ji bo axaftinê navê xwe dabûn nîvîsandin, yek jiwan rabû û dest bi axaftina xwe kir:

— Ez zî dixwazim xîçek li ser vê koniyê bisekinim û uneriyêñ xwe bibêjîb; ke heval li ser vê koniyê baş tartışme bikin....

Çend nûneran li hev nêrî... milêñ xwe kutan û lêvîn xwe badan.

Nûnerê Komela kevnare carek li rojevê nihêrî û carek ji li dîwanê... di cî de rabû ser xwe. Pêñûsa xwe bi hişkayı avêt ser masê. Pêñûsa rep û ket erdê. Berê xwe da derhîn ne gîhîst nav deriyê salonê, dest bi kişandina cixara xwe kir. Bi kul û keser dûmanê kişand hundîrê xwe û di hêvîlên xwe de wek dûwa trênen berda der. Hevalêkî wî li salonê pirtûkan difrotin; ev rewşa wî ya ha ya ne baş dît û ber bi widimeşîya wî, xwest ku hinek moral bide ew. Lê hîn nêzîkayı lê nekir bû, ew teqîya:

— Gostermiş dike ki ev arkadaş baş bi kurmancî konişmis dibe. Ji ber ki ez baş bi kurmancî nîzamîm, ez kefîmîn nû not dikim. Min gelek kefîme yazmışkir. Ji bo min kongrê gelek rind bû. Ez li erdê kongrê kurmancî ogrenmiş bûm. Gelo tu dizanî mana "xîçek" ci ye?

Ragîhîst pêñûsa xwe ku heval mana kelîmê bêje û em ji binivîsine.

Hevalê nûner berê serê xwe bi mana "na" de hejand û paşê:

— Wele ez bi xwe ji nîzamîm. Dibe ku kelîmeke nû be. Navbera min û ziman hewqas tune.

Serokê dîwanê disa mîqrofonê ber bi xwe kişand û:

— Hevalê nûner berê serê xwe bi mana "na" de hejand û paşê:

Ji kurdêñ soran yek di ser biraderê xwe de vege riya:

— Kaka, serek bo ci ziman qise kir-dûwa?

— Min nezam, bilam Behdînî niye. Min tê nagîhîm kongre bo mirdûwa an zindûwa!...

Serokê dîwanê li lîsta axaftvanan mîzekir û:

— Ica dora xeberdanê a heval kul-giran e. Fermo heval Kulgiran!

Heval Kulgiran ne çû mîqrofonê û di cî de rabû piyan û dest bi axaftina xwe kir:

— Eger federasyon bi qewetê derneğe xwena iş neke ise, federasyon hîc dimeşî mi? Elbet dûrim wanî bi be, nameşime... Merî baş dibîne federasyon çito xwe ra doş dibe!

Kurdêñ ji Kurdistana Bakûr li hev mîze kirin; lê yekî kurmanc xwe ranegirt û piste kurtî ji hevalê pêşîya xwe pîrsî:

— Ica ev ci kurdi ye?

Hevalê wî vege riya pey xwe û bersi-va wî da:

— Ev ji kurdiya qîlopanî ye.

Serokê dîwanê qîrika xwe çêkir:

— Ji bo xeberdanê navê sê kesan di dorê de heye. Ji derê van kesan êdî

kes nikare di vê nuxtê de xeber bide. Ü niha ji dora heval peyvnerm e. Kêrem ke Heval Nermpeyv!

Lê bi rastî heval nermpeyv wek navê xwe nerm nerm dest bi peyva xwe kir:

— Divê ji bo organizasyonê kommunan alternatifên kongret çêbin. Berî her tiştî destûr bê guhaztin. Destûr argumentên obligatorîsk e. Învandarverket û Învandrar iñrvatning ji, ji me aktiviteten eskertiñ dixwazin...

Çend endamên dîwanê serê xwe kîrin ber hev û bi tirkî ji serokê dîwanê pîrsin:

— Ica ev bi kîjan devok dipeyve?

Serok bi kenîn bersiv da:

— Ev bi devoka Kurdistana Sêdê dipeyve.

Heval nermpeyv ji ber ku kongret peyvî, kurt peyvî. Ev car dor hat ser heval Zimanzelal. Heval Zimanzelal ber bi kursiyê meşîya. Berê kaxizên xwe da ser hev û dest bi axaftina xwe kir:

— Ez dê kin bıştexilim. Em hemî zehf dizanîn ko zirotî federasyonê ne qenc e. Heftîn federasyonê çedîbin, hîzib û cemeat nayê. Muşkulanê

zehf ji destûre tê. Divê mirov destûrê baş tesçûl bike.....

Heval Zozano çend caran li ser hev destê xwe bilind kir, dixwest ku peyva heval Zimanzelal bide birîn. Lê serok wî da rawestandin û jê re got:

— Heval Zozano ka piçek musade bîke bila heval Zimanzelal peyva xwe bîqedîne, tu paşê gotina xwe bêje...

Heval Zimanzelal dawiya peyva xwe anî û serok bi dest işaretê heval Zozano kir. Zozano di cî de rabû:

— Ez tera ci bêjim... serê sübê va ez heqê qeziyê dixwazim, lê te mira heqê qeziyê nadî. Bi tehrekî destûrsizî ti kongrê dimeşîni. Kongrê ne angore destûre ye.....

Serok bi hîrs qeziya heval Zozano birî:

— Na, keko na! Qey ti di bin masê de destê xwe radikî. Min hetanî nîha nedîtiye ku te heqê qeziyê xwestîye. Fermo di cî yê xwe de rûne! Ne heqî û bextereşiyê neke bira!!!

Ica serok heqê axaftinê da heval Zorkurd. Heval Zorkurd, bi lez û bez bi ber miqrofonê kişiya û miqrofon

anî ber devê xwe û dest bi axaftina xwe kir:

— Biraderekani xoşevîst! weziî federasyon ewha nabe. Mefzûr e, her komeleyek bi wacîbatî xoy helsê...

Heval Rêziman, di rêza paşî de rûdinişt û heta ku quweta wî hebû destê xwe li masê xist:

— Ev kongrê çik bûwe.... Bû çar roje ku çik dibe. Gundemê çik dikin... destûre çik dikin.... Wilo çik kirin qenc nîne....

Ji nav mîvanan birêk kes rabûn salona kongrê terk kirin û çûn der. Yekê ji wan bi dengekî bilind digot.

— Ev ci kongre ye, ci rewş e!.. tam bû çar roj, min tiştekî ji zimanê wan fam nekir. Ez nizamin ev ci ziman e!!

Yeki din eniya xwe mîzdîdan û di-gotin

— Kuro, kongra cil ziman e. Bi rastî mirov nizane bi ci zimanî dipeyvin!

Lê li hundir hêj kongrê dom dikir. Dibe ku hêj ji dom dike!

## ŞOREŞA OKTOBIRÊ

Dî diroka çînan û gelan da hin bûyer hene ku mirov pêwîstiya bîranîna wan dîbîne Bê goman, van bûyeren ku çêbûne gora qencî(bâsi) û xirabiya wan, dî jiyana şerê pêşveçûn û paşveçûna mirovatiyê da rolekî pozitîf an ji negatîf standiye. Divê pêwîst e ku mirov, gora reng û girîngiya van bûyeren dî çarçowakî objektif da lê kolîn bike û gora rengê wan yênetewî an ji navnetewî bi bîr bîne û lí hîber van bûyeren piştgîrî an ji dijîtiya xwe pêk bîne. Ji van bûyeren ku di dîrokê da çêbûne yek a herf girîng ji, şoreşa Oktobirê ye.

Wek tê zanîn dî 17' ê meha Oktobîrê (Cotmehê) 1917' an da li Rusya'yê Şoreşa Oktobirê ya sosyalist pêkhat. Li ser Şoreşa Oktobîrê û girîngiya vî bûyerê, divê hewce ye ku mirov li ser dîroka rojê beriya Şoreşa Oktob

rê lê kolîn bike. Eger mirov li bûyeren çarafî cihanê û welatê Rusyayê lê kolîn çêneke, qîmet û girîngiya Şoreşa Oktobirê baş tê nagîhîse.

Wek kesen şoresger ji dizanîn, berî şoreşa oktobirê, di gelek weletan da şores pêkhat, wek Elmanya, Firansa, İngiltere û hwd. Xeynê Şoreşa Qomîna Parşîsî ku emrê vê şoreşê pir kurt bû û ji alf burjûwazî ve hat fetisandin. Şoreşen tevayî cihanê xwedî yek rengekî bûn û tenî iktidarê(kîrdaye-tê) dest gohartîn û li gel wan teda û zilm, kedxwarî, dubendîti her tim berdewam kir.

Berya şoreşa oktobirê mirov dîkare bi hêsa bêje ku li her weletasazûmanekî kedxwarî, teda û zilm hebû. Ev hebûn ji, di hêla cihanê da sistema sazûmana borjûwazî ya kedxwer şanê me dîda. Lê bi serketina Şoreşa Oktobirê ve rengê vê sistema kedxwer hat guhartîn.

Berya şoreşa oktobirê, ilmî çîna karker di teoriyê da mabû û ev problem di nav herekên şoresger û pêşverû da bi awakî cûre cûre dihatin minaqashîkirin û her kes gora ditinê xwe vê teoriyê di çav da derbas dikirin. Lê dî merhala taflî da Bolşevîkan vî teoriyê xistin jîyanê û di vî kar û

### S. QERECDAX

barî de serfîraz bûn. Cara yekem bû ku di welatekî kapitalist împerialist da şores pêk dihat.

Rusya, welatekî împerialist bû û welatekî xurt bû, lê ji alî din ve, di warîpê kanîna şoresê da, di nava çarçowa zencîra împerialist da helqekî zeş bû û gora şert û şîrûte vê problemê, bolşevikan xebatekî mîrxas pê kanîn û şoresê bî ser xistin. Bi serketina şoreşa oktobirê, du nuqtên girîn ketin jîyanê û teoriya li dij van nuqtan ji di pratîkê da hat pûçkirin. Ev du nuqte ev bûn :Yek jê, di yek welatekî da serketina şoreşa nikari bi serkeve. Lê pratîkê, vî fikrî pûç kir. Meselê ka din ji, serketina ilmî teoriya karker bû. Heyanî wê dewrê hêzîn paşverû û hêzîn paşverû, vê teoriyê tiştekî xeyal didîtin, lê bi vê şoresê ve ev tiş ji ji alî jîyanê ve hat mahkum kirin.

Berya şoreşa oktobirê, her wek li gelek weletan, li Rusya ji, teda zilm, kedxwarî, hovîti, di nav ci-vatan da dubendîti dihat domandin û tebeqa xwedî sermayan ya



heri mezin, selténat û kedxweriya xwe her tim berdewam dikir û ji ali din ve ji, sedhezaran bi milyonan di bin nîrê koledariyê da dihatin pelçiqandin. Lê bi serketina şoreşa oktobirê ve, karker, gundi û tebeqên xebatkar yêñ xizan û belengaz, ji bin nirêñ kedxwariyê derketin û bûn efendiyê welat. Bi saya serketina şoreşa oktobirê, ne tenî karker, cotkar, gundi û xebatkar ji bin teda û zilmê xilas bûn, li gel wan, gelên bindest û yen koloni ji, ji bin nirê dîlîtiyê rizgar bûn û civatekî wekhevî da cihê xwe standin.

Wek xwendevan ji dizanin, berî şoreşa oktobirê li Rusya'yê geleknieweyen cûrbe cûr hebûn. Tenî netewa Rus ya spî serdest bû û yêñ din ji bîtevayî, bi nîrê koledariyê ve hatibûn dilkirin. Loma ji bo Rusya digotin girtî geha gelan' Lê bi serketina şoreşa, deriyêñ girtîgehan hat şikan din û gelên bindest ji bin nîrê koledariyê rizgar bûn. Heyanî şoreşa oktobirê mesela gelên bindest ya netewî, tenî di nav çarçowa her welitekî ku gelên bindest li wir hebû. Wek meselekî netewî mabû, lê piştî serketina şoreşa oktobirê slogan û mesaja karkeran 'Karkeren Hemû Welatan Yekbin!' bû. Lê piştî şoreşa oktobirê ev mesaj û sloganana kar-

keran hat guhertin û bi şiklê 'Karkeren Hemû Welatan û Gelên Bindest Yekbin' hat formilekirin


Bi gotinan (Bi teoriyê) dibe ku pêkanîna şoreşkî hêsa xûya bîke, lê praktikê da, ev rewş ne weha hêsa ye û gelek gelek dijwar e. Tercûba praktika Rusya ji vê rewşê şanê cihanê da. Piştî bi serketina şoreşê, hêzên burjûwazî qewetên xwe hemû gîhandin hev û li dij kirdayeta karker û gundi rîexistin pêkanîn û ji bo hîlweşandina iktidara nûh gelek êrisen dijwar birin ser iktidarê. Dî vî tekoşîna dij-şoreşê da, burjûwaziyê Rusya ji ne tenî bi serf xwe bû, her weha burjûwaziyê cihanê ji alikarî - piştgiriya vê xebatê kirin. Iktidara nûh, li gel bêtêrcûban ji, xwe û iktidara xwe bi mîrxasî parastin û êrisen dij-şoreşê badikhewa kirin. Û dîsa, ji bo ku ev şoreş qurf xistibû canê bûrjûwaziyên hemû welatan, hemû welatîn kapitalist-imperialist vî iktidara nûh di warf fermi (resmî) da qebûl nekirin, berê tîrêñ xwe yêñ tüj dan şoreşa nûh ambargo ya aborî û hwd. dan ser Sovyet, milê xwe şemîrandin û ci pêwîst bû û ci ji desten wan hartin kirin. Lê ev êris û xebatîn wan tev vala çûn. Sazûmana karker û gundiyân hilnewesiya, roj bi roj xwurt bû û şoreş li cihê xwe rûnişt. Navê Rusya ji hat guhartin

û bû Yekitiya Sovyetan.

Loma mesela şoreşa oktobirê, ne tenî meselekî netewî ye, her weha meselekî navnetewiye ji. Tesira şoreşa oktobirê li çar alf cihanê belav bû. Ev tesir ji bo karker, xebatkar, gundi û gelen bindest, tesireki pozitif e, qenc e, lê ji bo kedxwar û zilimkaran ji tesireki negatif e û nebaş e, vî rastiya ha her mirovîn ku eqil di serî wi, wê de heye qebûl dikin, heta hêzên burjûwazî bixwe vî rastiye nikarin û qebûl dikin. Bi saya şoreşa oktobirê, li gel sazûmana burjûwaziya kedxwar, xwînmij sazûmana bêkedxwar, bêteda û zilm, sazûmana biratî, wekhevî û aşıtî saz bû û ev sazûman ji, bê guman bû alternatifekî xurt li dij sazûmana kedxwar û xwînmijan.

Şoreşa oktobirê, li gel karker, gundi û xebatkaran rîki nûh ya ronî da ber rizgariya gelen bindest û koloni ji. Bi saya serketina vê bûyerê, serê rizgarî ya gelên bindest ji, bû ji helqekî tekoşîna şoreşa cihanê û di rizgariya gelên bindest da, serçaviya tova şoreşa oktobirê cîhekî gelek girîng.

Bi serketina şoreşa oktobirê vir de 68 sal derbas bû. Di navbeyna 68 sal da demekî dirêj derbas bû û li cihanê gelêk guhartînê nûh çêbûn. Di gelek welatan da şoreşen karker pêkhatin, cîvakên edla û wekhevî saz bûn, li gel van bûyeran, gelek netewen bindest di şerê serxwebûn û azadiyê da serfraz bûn û di nav komâ milletan da cihê xwe yêñ bi rûmet standin. Lê mixabin hê ji li cihanê gelên bindest û koloni hene, hin ji li gelek welatan teda, zilm, hovîtî û kedxwarf tê domandin. Her wek hin netewan netewa Kurd û welatê me Kurdistan ji di bin nîrê koledariyê da zarezar e. Lê xwedî bîr û baweriye ki qeim in ku dê roj bê, gelê Kurd ji serxwebûn û azadiya xwe bistine û welatê xwe yê xweşik di bin şerten biratî, wekhevî û edleyî yê da bixemîlîne, ev rojin ronî ne pir dûr e, rojîn pêş yêñ rohniyê û xweşiyê yêñ gelê me ye. Mîrov, pêwîst e ku di şerê rizgariya Kurdistanê da bi dîlgermî salvegera 68 saliya şoreşa oktobirê piroz bike û bi vî awayî wazîfê xwê yê enternasyonalî pêk bîne û di cihanê da dengê xwe yê heqî yê derxîne...



## HESEN HİSYAR Jİ KOÇ KİR

Mixabin, hezar mixabin; koça mezinê n me dom dike.  
Kerwan direjtir dibe.

Do Tewfik Wehbî, Elledîn Secadî, Hesen Qizilci, Yilmaz Guney û seyda Cigerxwîn çûn. İro ji Mistefa Remzi Bucak, Qanadê Kurdo û Melle Hesenê Hişyar.

Ev koça dijwar welatê me di nav şinê de dihêle. Xelkê me pê xemgîr dibe. Em pê dişewitin. Ji lewre, ev kes bûn ku di şert û mercen herî xirab de li dijît dijmin rawestin û nîşan dan ku Kurd ne miri ye. Wan bi keft û letfîn gelek dijwar ve şer kirin, da ku ji me re, yanê ji nifşen nû re tiştine bihêlin.

Jiyana wan di eynî kat de tarîxa welatê me ye ji. Her yek- di warê xwe de- alikî tarîxa me nîşanê me didin. Bi xebat û berhemên xwe şer, derd, kul, hevî û daxwaziyên xelkê me ber bi çav dikin. Piraniya wan di geremoliya herî mezin ya cihanê de xortiya xwe derbaz kirin. Hingê bi hêvî bûn; şerê cihanê yê yekimîn hawîrdor girtibû. Welat ji hev diketin, dewletên mezîn hildiweşyan û sinorêñ kevn ji holê radibûn. Kurd ji weki gelên din yên bindest xwedî hêvî bûn; ku maşen xwe bi dest xînîn û welatê xwe ji bin nîrê bîyaniyan rizgar bikin.

Lê ne bû. Ne maf bi dest ketin û ne ji' welat rizgar bû. Fersenda welatekî yekgirtî ji dest reviya. Di dûzana nû ya cihanê de, ji hêviyên Kurdan re cîh ne ma. Dewletên ku ji şer serfiraz derketibûn. xarîten nû çêkirin. Lê di wan xarîten nû de ji, ji Kurdan re cîh tune bû û

xêzên xarîtan ji ser dilê wan derbaz dibûn. Welatê wan carek din di nav çend dewletan de hatibû dabeşkirin.

Piraniya mezinê me yên ku me fro di nav valahiyekê bê dawî de dihêlin û derin, ji wan rojîn tarî dihatin. Bi kurtebirî meriv dikare ji wan re bibejê, nifşê şerê cihanê yê yekemîn. An nifşê siûdxirab.

Belê, ew siûdxirab bûn. Ji ber ku di demeke kurt de xebata welatekî azad û yekgirtî, cihê xwe berdabû ji şerê xwe parastinê re.

Kêm an zêde, lê wan li gor qeweta xwe xebat kirin û iro ji ji me xatir xwestin û çûn

Melle Hesen Hişyar ji yek ji niwêrerên vê nifşê bû. Wî ji wekî hevalên xwe, li ber xwe da, çek hilda, nivîşî û xebat kir. Di nav xebatên cûrbecûr yên niştimanperweriyê de cihê xwe girt. Gerçî Melle Hesen weki hinek hevalên xwe di seranserê welêt de ne bi nav û deng bû, lê wî ji zarotiyê heta nefesa xwe ya dawiyê ji bo welêt xebat kir

Melle Hesen Hişyar di sala 1907' an de li gundê Serdê, ku di navbera Hênen û Licê de ye, hat dinê. Ew ji malbateke dewlemend bû û bavê wî keyatiya gund dikir. Wî li gor ımkânên wê rojê xwend û bi alikariya eşira xwe (Zireki) xwe pêş xist.

Li gor ku wî nivîsiye, ew di destpêka 1920' an de bi serekên tevgera Kurd ve dikeve nav dan û standinan. Li Diyarbekrê İhsan Nuri Paşa û hevalên wî nas dike.

Bi Qedri û Ekrem Cemîlpasa ve hevûdu dibînin. Wê demê tevgera kurd li pey rêkxistineke xurt, ku bikaribe yekîtiya xelkê pek bîne. Ye êdi baweriya tevgera Kurd bi Mistefa Kemal û hevalbendê wî nayê. Sextekarî û durûtiya Mistefa Kemal derketiya ser avê. Kurd bi xwe divê ji bo rizgarkirina welêt rêkxistinê xwe ava bikin û welatê xwe biparêzin. Lê wext kêm e û bi lez divê. Serek û ronakbirêni Kurd wekî Xalid Begê Cibîrî, Îhsan Nûrî Paşa, Doxtor Fuad, Bâvê Tûjo, Şêx Seid dikevin nav dan û standinêni piralî û xurt.

Hingê Melle Hesen Hişyar jî li gor imkanen xwe dikeve nav vê xebatê. Ji Îhsan Nûrî Paşa re alikarî dike û dan û standinêni wî bi heremên Farcîn û Hênen re pêktîne. Û di kata welatparaziyê de cihê xwe digre.

Lê raperîna Kurd ya 1925' an bi ser na keve û rêberen raperînê, tevî Şêx Seid, Xalid Begê Cibîrî ! Kemal Fewzî, Doxtor Fuad, Seyid Ebdulqâdir, Bâvê Tûjo bi dar ve dibin. Girtiyen din jî bi cezayen giran ve mehkûm dibin. M.Hesen Hişyar yek ji wan kesan e, ku ceza dixwe.

M.Hesen Hişyar demeke dirêj di girtigehê Turkan de dimînê. Ev jîyana girtîgrîhê jî bo wî dibe tecrubekê hêja. Nemaze di girtigeha Nigde de gelek tişt fîr dibe.

Ew pişti jîyana girtigeha ûsyan vedigere Hênen û li wê derê bi cih dibe. Lê dilê wî bi şewat e. Hêvi şikestîne. Welat di nav 'mij û dûxanê' de ye. Dewleta Tirk bi her awayî welêt ji hev dikine Xebat şer, liberxwedan divê. Lê çawa û kî?

Hingê çirûskîn azadiyê dest pê dikin li ser çiyayê Agiriye vêdikevin. Hêviyên li dij bindestiyê rawestan, li wê derê dixuyen. Şerwanen Kurd berê xwe didin bi çiyayê Agiri û ala azadiyê li bandava çiyê dadiçikîn. M.Hesen Hişyar jî xwe digihîne şerwanen Kurd. Şoresa Agiri di demeke kurt de fireh dibe û rêçen xwe berbide nav xelkê. Lê mixabin, serhildana ku ji aliyê Başûr (Kurdistan) Sûrî û dêweren Mardin, Riha, Diyarbekr û Botan) tê payin, bi ser na keve û dewleta Tirk bi alîkariya 'dosten xwe ' dor li şoreshê digre. Bi vî awayî şoresa Agiri jî têk dere. İcar şerwanen Kurd tevî kumanadarê xwe Îhsan Nûrî Paşa, derbasê Iranê dibin. M.Hesen Hişyar û çend hevalen wî li Iranê ji Îhsan Nûrî Paşa vediçetin û dizivirin, Xalid Cibîrî û Yusif Ziya Beg berî serhildanê hatin girtin, pişt ne bi darvekinin. Ûsyan tê Kurdistan Bakûr. Ew dixwazin li doraliyê wanê bimînin, lê keysa mayinê bi dest wan nakeve, ew jî ji hev vediçetin.

Piştî têkçûna şoresa Agiri, êdî M.Hesen Hişyar Kurdistan Bakûr na bîne. Ji lewre ew tê û li Kurdistan Bakûr, li Amûdê bi cih dibe. Qamusli, Amûd û tevayiya 'binê xetê' wê demê merkeza tegera Kurdistan Bakûr e. Serok û ronakbirêni Kurd yê, ku ji Kurdistan Bakûr reviyane, hatine li 'binê xetê' bi cih bûne.

M.Hesen Hişyar dikeve nav wan û bi wan re dixebeit. Wê demê Celadet Bedirxan, Menduh Selim, Qedri û Ekrem Cemîlpasa, Hemzeyê Miksî, Osman Sabrî, Haco Beg û gelek kesen din li wê derê ne. Wan bi hev re bi navê XOYBUN rêkxistineke sîfîsi damezrandine û ji bo raperîneke mezîn li Kurdistan Bakûr dixebeitin. M.Hesen Hişyar jî di vê rêkxistinê de cihê xwe digre.

Hingê li Şamê bi rêberî û berpirsiyariya Celadet Bedirxan kovara hêja HAWAR diweşe. Gelek nîfîskar û hozanen Kurd, wekî Kamuran Bedirxan, Osman Sebrî, Cigerxwîn Nureddin Usif (Zaza), Qedri Cemîlpasa, Tevfik Wehbî di kovare de dînîvîsin. M.Hesen

Hişyar jî di vê xebata hêja de cihê xwe digre û dest pê dike bi helbest û nîfîsarêni xwe beşdarî vê xebatê dibe. Ji pişt re jî her waha di kovareni RONAHI û ROJA NU ku disan ji aliya Celadet Kamuran Bedirxan derdiketin, de dînîvîse. Ew, piraniya nîfîsar û helbesten xwe bi navê HİSYAR dînîvîse.

Ew di navbera 1953- 57'an de di kovareni WİCDAN û HURRIYET de dînîvîse. Ü tevî Rewşen Bedirxan, Dr. Nûrî Dêrsimî, Dr. Nafîz Usîf bi navê Komela Civakî û Kulturi ya Kurdistan Sûrî rêkxistineke pêk tînin. Ü ew heta mirinê her di van xebatê xwe yêñ welatparêziyê de berdewar dibe.

Min M.Hesen Hişyar cara pêş di havîha 1977'an de dît. Ez û hevalê gorbehiş Necmeddin Buyukkaya li Qamişli bûn û me xwest em herin wî bibînî. M. Hesen Hişyar li odekê biçûk hebû. Li ser rehlê cîld kitap û defter hebûn.

Hingê wî serpêhatiyen wî hûn. Ew bê westan li ser bûyeren şoresa Şêx Seid, Agiri û 'binê xetê' dipeyiñ. Dî gei ku kal bû, bi seetan li ser bûyeren hûr dibû û wan bi awakî gelek zelal dida fahm kîrinê. Li ser bûyeren sîyasi û civakî dîtinêni wî hebûn. Li ser ziman, kultur û tarîxa Kurd xebitbû Helbest nîfîsibû û karê rêkxistinî û her sal bi navê AGAHÎ hejmareke kovar diweşand. Ev yeka ji bo min bû surprîz. Min ne dipa ku ez dê li wê oda tarî kalekî weha bibînim.. Ji wê rojê pê ve jî, dema ez diçüm Qamusliyê me hev ûdu dîdit. Ez diçüm ba wî û em li ser tiştîn ku wî di wan rojan de nîfîsine. dipeyiñ. Carîna jî, wî gazine ji me 'xorten kurd' dikirin û ji bo yekîtiyê nîfînên xwe digotin. Ew pir ber diket ku hêzen sîyasi yêñ demen dawî de jî nîşan dida.

M.Hesen Hişyar her û her dixebeitî ku li pey xwe tiştîkî hêja bîhêle. Wî her gav digot; 'mezinêni me ji me re tu tişt ne histinê. Lê, em divê vê yekê ne kin.' Cara dawî, dema min wî dît ( 21- 22. Adar.1985). wî helbesteke nû nîfîsibû û helbesten xwe yêñ kevn dabûn hev. Me bi hev re li Qamusliyê û Girê Moza Newroz pîroz kir. Ew gelek kêxwêş bû ku hemû Kurdistan Bakûr li ser piyan bû û Newroz pîroz dikir. Digot, 'Çavîn min van rojan ji dîtin. Edî ezê bê xem herim gorê.'

M.Hesen Hişyar jî wekî hevalen din yêñ nîfîsa xwe, bi hêviya rizgarbûna Kurdistan Bakûr jiya. Ü wî, wekî ku di wesyetname xwe de jî nîfîsiye. Dixast li ser axa bav û kalen xwe nefesa xwe ya dawî bide. Lê mixabin, ev yeka jê re nesib ne bû û roja 14. İloni 1985 li Qamusliyê koç kir.

Wekî ku di wesyetname wî de dixuyê, M.Hesen Hişyar li pey xwe gelek tiştîn hêja berdane. Enstitu, komele û weşanxanen Kurdistan divê berhemen M.Hesen Hişyar ji bîr ne kin û di rojeket zûtir de wan biweşînin da ku em hemû jê pardar bin.

M.Ferzend BARAN

Têbini : Cihê ku Melle Hesen Hişyar di wesyetname xwe de xwestiye tê de were veşartin(Dugir), di navbera Qamusli û Tîrbî Spî de ye. Nîfîsan M.Hesen Hişyar, ku ji Kurdistan Bakûr bi dûr ketibûn, li wê derê veşarti ne.

Wesyetname H. Hişyar di rûpela 18 an de ye.

# jina leheng

LOKMAN POLAT

Leşkeren Şêx Seîd efendi çarmedorê bajare Diyarbekirê girti bûn û hinek jê keti bûn nava bajêr. Di nabeyna leşkeren kolonyalistên tîrkan û leşkeren azadîxwazan kurd da şerekî dijwar berdewam dikir. Lê heft mixabin ci feyde ye ku mezinê tîrkan M. Kemal bi fransizan ra xebe ra xwe kir yekû di ser riya xeta frensewî re li leşkeren xwe anîû li ber Diyarbekrê ketin pişta leşkeren Şêx Seîd û di parve da li wan xistin. Leşkeren Şêx Seîd efendi mecbûr man ji nava bajêr û dora bajêr parve kişiyan û dîsan bere xwe dan çiya û gundan.

Kolonyalistên tîrkan hêzên xwe qewî kirin û li pey leşkeren kurd ketin, çiya û gund dan ber lingên xwe û şewitandin. Zarû, jin kal, kî ket desten wan, ew kuştin, weh şetî û barbariya xwe li hember miletên dinê dîsan nîşan dan û Kurdistan Bakur kirin gola xwînê. Diji vê zordestiû xwînxwariya kolonyalistên - tîrkan gele kurd be hempa di ber xwe dida û heroj di gund û çiyayê Kurdistan da şerê giran çedibûn. Emê Faro, Ehme Hiso, Hesen Keyayê Celki, Emê Heydo û peşewaye kurd, serba-zê leheng Yadîn Paşa di çiyan de berxwedaneke mezin nîşan didan û dijî kolonyalistan şer dikirin.

Serekleşkerê tîrkan Eli

Heyder Beg emir da leşkeren xwe ku tev hev top bibin, dûre jî li hember wan sekini silav li wan da û ji wan ra go: "Heta nuha me bi mehkûman ra pir şer kir û me pir ji wan kuştin û girtin. Lê vê carê şerek li peşiya me ye. Em pêhesiyane ku mehkum li ku derê sekinîne, em ê anu ha bi çin û bigrin ser wan, lê divê hûn pir hayî ji xwe hebin, lewra serokê wan mehkûman merivekî bi nav û deng e û hûn hemû binavê wî hesiyane Temamê kolordiyê li pey ketiye lê kesekî nikaribuwe wi bigre. Divê em yan wî bigrin, an jî wî bikujin. De hayde em hema nuha bi rê kevin." Leşkeren tîrkan ketin rê û bîlez meşîyan.

Yadîn Paşa, xwezûrê wî, jîna wî Teli Xanim û çend hevalen din rûniştî bûn bêna xwe didan, çend novedar jî çavê xwe kuta bûn, li riyan û derû doran mîze dikirin. Hendî piştî esrê bû, roj li ber ava bû, novedarekî dît ku waye leşkeren tîrkan ji wê derê ve ber bi aliye wan ve tê. Novedar hêdîka deng li hevalen xwe kir û got: "Waye leşkeren Romê ji wê ve tê" û li pişta kevirê bi tilunç rûniştî, ma. Hevalen wî jî di nava deviyan da û pey kevir-an ciye xwe girtin. Yadîn Paşa hat ber novedar, mîze kir ku ere waye leşker nêzîki wan dibin.

Yadîn Paşa û hevalen wî şerên çetetiyê (gerîlatiyê) baş zanî bûn, ji boy ku leşkeran bikşînin nava xwe û di her alî da wan bidin ber gulan helqeke weki "U"-ê çekiri bûn. Dema leşkeran nezi kayî li wan kir, Yadîn Paşa gule berda leşkereki, ew di cî da ket û hendî bu teqareqa tivingan şerekî pir mezin û giran çebû. Pir leşker hatin kuştin, çend hevalen Yadîn jî şehîd ketin. Heta ni tarîtiyê negirtana erde Yadîn û hevalen wî nikari bûn ji ciyên xwe rabin. Leşker pir bûn û di se aliyan da dor li wan girti bûn. Yadîn Paşa ji aliyekeki şer dikir û ji aliyekeki din ve dil dida ber hevalen xwe, wek di her şerî da bang dikir û mîna şeran diqîriya: Léxin, birano lêxiniro roja mera ye, em ê şer bikin hetanî erd u eyar û namusa me ji ber ling an xilas be!"

Teli Xanim her tim cilê serbazan (subayan) li xwe dikir, weki mîran çek û rextên xwe giredidan û wek pilingan şer dikir. Di vi şerî da jî weki şeran xwe ji ber vi kevirî davet pey wî kevirî û wek baranê gule berdida ser dijmin. Ü bû bû du saet ku şer destpekiri bû, leşkeren ku hati bûn nezi wan hemû hati bûn kuştin, loma jî dengê qulan kêm bûbû. Teli Xanim rabû ku ciye xwe bige-

hurinê lê mala dijmin xirab bibe gulek berdan wê, li ser memika wê ket û ew kete xware, qet deng jê derneket, heneki sekini û hedi, hedi xwe ber bi aliye kevire ku bavê wê li ber rûniştî bû kişand, nezigahî lê kir, vêja bavê wê ew dît ku Teli xwe bi erde ve kaş dike û bi aliye wî de té. Çirpîni bi dile wî ket, fam kir ku gule li Teliye ketiye û birîndar bûye. Ji şuna xwe rabû çû wê kişand anî pey kevire xwe û eniya wê ramusa û got: "Almasa dile min ci bû bi te? Çavê dijmin kor bibe". Teliye got: "Babo tu dev.ji min berd, şerê xwe bik, da ku dijmin pêşda neyê û ger tu karîbe bake Yadîn bila be ber min".

Hendi tariye girtî bû erde, bûbû şev. Yadîn pê hesiya ku jina wî Teli bi-iindar bûye, xwe kişand û hat ber Teliye sere wê da ser çoka xwe û got: "Xem-mexwe, ez ê heyfa te (Tola te) ji van kûçikan bistînim". Teliye destê Yadîn girt anî ber devê xwe maçı kir û êstir di çavî da wek barana buharê hurik hurik hate xwarê, ji hundire keze-ba xwe ve axînek kişand û gotê: "Yadîn'min tu pir li ber min mekeve, gelek law û jinen kurd şehît bûne, ez jî ji wan yeka me. "Xezure Yadîn ji wanra got: "Waye bû şev her der bûye tarî, em xwe paş da bikşinin û em biçin. Leşkerê dijmin pir e li me bibe ronî em ji vir xilas nabin". Yadîn got: "Rast e, em gerek ji vir biçin, lê Teli birîndar e gerek çend kes wê helgirin û pêşî da biçin û çend kesé din jî li vir bimînin, şer bikin ji bo ku dijmin bidin sekandinê, da ku bi peyme nekevin". Xezure Yadîn got: "Ez ê li vir bisekinim, hûn herin". Yadîn got: "Na ez e li vir bisekinim". Di na-

beyna vê xeberdanê da Teliye sere xwe bilind kir û got: "Na, hûn kesekî li vir nasekinin û ji bo min xwe nedin kuştin. - Xwin ji min pir çû û edî hale min tuneye, hûn min helgirin bibin jî felata min tune ye, ez xilas nabim, ji bo min mefikirin, min ber din, hûn ji xelqe ra pêwist in, gerek hûn ji vir sax xilas bibin û biçin".

Bavê wê lê vegerand: Qîza min, delaliya dile min em ê çawan te di vî hali da li vir bihelin û biçin? Em ê çawa li riyen xelkê mêzekin? Ew ê hemû kes nebêjin ku namusa xwe ganîti di nav lingên neyaran(dijmin) de hiştin û reviyan". "Babo erê tu rast dibêjî. le ez jî na-xwazim ku hûn min li vir ganî bihelin, derba min xidar e û laşê min pir deşe, werin min ji vî ezabi xilas kin, guleke berdin eniya min û mesezin herin".

Roja giran li wan qewimi bû û şeva xirab bi ser wan da hati bû, çare tine bû. Teliye bibrana ew ê çend kesé din li wê derê bisekin yana û dawî ewe bihatana kuştin. Hemû li wê bimana û li wan bibana ronî wê kesek ji wan xilas nekirana. Xezure Yadîn Paşa pir fiki-riya û dawiye got: "Hendi keça min ji çavê xwe bavejin derba wê giran e û nafilete, bila ji bo wê kesekî din neye kuştin. Çavê me bar nabe ku em wê li vir ganî bihelin bila pir eziyet neksîne, Yado de rabe guleke berde pê û em lêxin biçin". Destê Yadîn Paşa negeriya ku gule berde hevala xwe, got: "Na, kekê ez jî gule berdim xwe, lê bernadim Teliye, ez jî hêviya te dihêlim tu çawan diki bike". Şîrqînek bi tifinge ket û li ezmân du hester li hev ketin, çiken agir ji ber wan firîn.

Hendi bû ronahiya sere si bê. Çend saet buhuri bûn ku dengê teqîna tivingan ne dihat. Qumandar Eli Beg Heyder Beg emir da leşkeren xwe: "de ji şuna xwe rabin, em ê meze kin ku ji mahkuman kî sax ma ye, an jî birîndar e ku em wan bigrin. Ji xwe me pir ji

wan kuştîye, belam ji me jî pir kes hatine kuştin." Qumandarê pozbilind bi dûrbînê li ciyê mehkuman meze kir û dît ku yek li erde ye û cile subayan lê ye, desten xwe li hev xist, këfa wî hat û got: "Geli leşkeran, mizgin li we me Yado kuştîye."

Këfa hemû leşkeren tirk hati bû, lê kesî newera bû bi aliye term ve biçuya, hemû jî dûr sekinî bûn û li term meze dikirin. Qumandarê tirk bi hêrs gote: "Hûn ç sekinîne heydin em biçin ber term se re wî jêkin bibin di qezê de bielqînin wekê ku me sere mehkûmân din bi seren daran ve kir, em ê serê vî jî weha bikin." Hemû bi hev ra çû ber term meze kirin ku term di nav xwînê de geviziye.

Qumandar Eli Heyder destê avet cîlêm Teliye ku wê li ser pişte biqelibîne, piş ko-jen we qetiyen ý memikên Teliyên derketin derive, çavê hemûwan beloq bû û ji xwe ra şas û eccep man.

Leşkerekî got: "Qumandarîm ez ve nas dikim. Ez gava Hesîr(dîl) keti bûm, wê gavê min ev jinka ha bi mehkuman ra dîti bû. Ev jina Yado Teli Xanîm e, wê her car ji mehkuman ra digot: "Van leşkeran berdin gune ne, çavê dê û bavê wan li riya wan e." Ý paşê jî me berdan.

Qumandar Eli Heyder çok da erde, eniya Teliye ramusa û rabû got: "Dijminen me pir mîr in, tirsa wan tuneye, gerek tu caran em mîrxasiya wan ji bîr nekin."



Di 5 ê meha 11 de Rêexistina Nivîskarên Cîhanê liqê Swêdê (PEN KLUP), nemeke ji bo wezirê karûbarê Hukukî (Adalet bakanı) Tirkîyê Necat Erdem re şand.

Ev name wilo hati bû nivîsandinê:

Me di derheqa endamê me yê hêja (şeref) nivîskar û soso-yolog Ismail Beşikçi deng û bahsên baş girtin, ku ew niha di girtixana Gaziantep da ye. Ev deng û bahsên ku me git-tine, Beşikçi, dikare tedavî û kontrola nexweşiya xwe bîke. Û destûr hatiye dayîn ku Beşikçi kare bixwîne û ziya-retvanê xwe qebûl bike. Em ji vê yekê gelek kîfxwes bûn. Ber wê daxwaza me ew e, ku Beşikçi bê şert û bê şumul azadiya wî bêt dayîn. Em û hun ji baş dizanin, ku Beşikçi, mafêن xwe yên tabî kar anîye, raman û nêrinêن xwe bi rengekî aştî gotiye. Ev mafêن ku ji aliyê hemû gelên cihanê hatiye qebûl kirin û tê parastin.

Em bawer in, ku rejîma we dê kirinek taybetî pêk bîne.

85. 11. 05

Thomas Von Veqsack  
SEROK

Per Agre Erkelius (endam)

## ŞEFİQ DUNDAR

### JİYAN Ü TEKOŞINA BEŞİKÇİ

Bi rastî iro zordariyeke hov û dijwar li ser İSMAİL BEŞİKÇİ heye. Ev zordarî perçek ji wê zordariyê ye ku li ser tekoşına netewî û demokratik a gelê kurd tê ajotin. Bi vi rengî tekoşîn û berxwedana Ismail Beşikçi, mustevâ-yek gelek berz daye. Ji ber vê yekê ye, ku rejîma Tirk û hestîkojên wê gelek aciz bûne, ji ber vi sedemîn Ismail Beşikçi, avetîne girtixanan.

Daxwaza van kevneperestan ev e, ku Ismail Beşikçi nedin axaftinê û pêñûsa wî bişkînin. Lê belê sed car mixabin ev zorker hestîkoj qet di jiyana xwe de rojeke dê negîhîn armanca xwe. Bi rastî Ismail Beşikçi kedkarek

## REWŞ Ü TEKOŞINA İ. BEŞİKÇİ

### THE P·E·N

A WORLD ASSOCIATION OF WRITERS  
SWEDISH CENTRE - FOUNDED 1922

P.O. Box 2052  
103 12 Stockholm  
Sweden

Minister of Justice  
Necht Eldem  
Adalet Bakanı  
ANKARA  
Turkey

Stockholm November 5,

Your Excellency,

We have got very satisfying informations about our Hon. Member, the writer and sociologist Ismail Beşikçi, jailed in Gaziantep.

We have been told that mr Beşikçi now receives medical treatment and that he is allowed to get readings and visits.

This, Your Excellency, has been pleasant to know.

But still and no less we demand for the immediate and unconditional release of mr Beşikçi. We know, and you know, Your Excellency, that mr Beşikçi only has practised his right to peaceful expression of thought and opinion which is a human right defended by governments all over the world. We believe that your government does not want to be an exception.

*Per Agre Erkelius*

Per Agre Erkelius  
Member of the Board

*Thomas von Veqsack*  
Thomas von Veqsack  
President



zanistîyê ye û di dîroka tîrkan de cara yekemin di nav tarîtiyek-taristaniyê de ronahiyek zanistî, bê tîrs pêxist. Ji ber vi çendî Ismail Beşikçi, di cihanê de ciyekî wilo girtiye, ku hêzêk nikare çamorek pê ve bike û ne baş nişan bide.

Zorkerên Tirk, çîqas Ismail Beşikçi bavêjin girtixanan roj-danekî lêdan û tadedayî pê bikin, hêjabûna Ismail Beşikçi roj bi roj hîn zêde û bilitirin dibe. Giranbiha di-be. U ew bilinbûna wî mirina dijmin ji roj biroj nêzîktîrin dike. Ismail Beşikçi, iro endamê rêexistina Nivîskarêن Cihanê ye. Ev ji bo dijmin bes e, hîn zêdetir e ji.

Ez di vê baweriyê da me, ku pêwîst nîn e ku mirov li ser jiyanâ Ismail Beşikçi dûr û dirêj raweste. Xwendevan tev wî nas dikan. Ji ber vê yekê çend gotinê xwe li gel xêz û silavê xwe ji bo Beşikçi dîhênerim.

Beşikçi di sala 1939 an de li bajarê İslâkîpê hatiye dinê. Di sala 1962 an de fakulta zanîngâ ya rêzânî tewa kir. Es-keriya xwe li bajarê Bedlîsê û Heqâriyê kir. Di zanîngâha Atatürk a Erzuromê de asistanî kir. Di sala 1967 an de dixtora xwe tewa kir. Beşikçi, dixtorê zanayê civakiyê ji bo ku pirtûka "Saziya Rojhilata Anadolê (Doğu Anadolu duzeni) bingeha nijadî û civakiya abori" nîvisand. Li ber wê çendî ji zanîngâhê hat avêtin. Di sala 1971 de di fakulta Zanîrên Rêzânî de dest bi xebatê kir. Di vê demê de hat girtin. Wî avêtin girtixana leşkeri ya Diyarbekirê. Ji bo pirtûken wî û dersên ku zanîngâhê de dabû ji bo wan dadgehêneş leşkeri 13 sal û 7 roj ceza pê dan. Ji girtixana Diyarbekirê hat surgunkirin û birin girtixana Adanê. Di efûya giştî de (1974) ew ji derket. Di sala 1974 an de wî xwest, ku di fakulta zanîrên Rêzânî de bixebite. Lê belê wî nehilgirtin. Nehilgirtina van bi zorayı bû. Hevalen wî yêne wek wî, tev dest bi xebatê kîrin. Ji wan tenê Beşikçi nehilgirtin fakulte. Di wê demê de Beşikçi, pirtûk dînîvisand û di çapxana Komal de didan çapkirinê. Di sala 1979 an de carek din ew hat girtin. Ü heta niha ji di girtixana Gaziantebê de ye. 10 Sal ceza dan wî.

### PIRTÜKEN BEŞIKÇI YÊN ÇAKPKIRI:

#### A - XEBATA BEŞIKÇI YA DEVRA YEKEMİN

- 1 - Aşireta Koçer a Elikan û Guherînê Rojhilat û problemen bingehîn.
- 2 - Aşiretên Kurdan ên Koçer guhurînê Civakî;
- 3 - Berçavkirina Xwenîşandanêñ Rojhilat;
- 4 - Saziya Rojhilat a Anadoliyê, Bingeha Nijadî, Civakî û Aboñ.

#### B - XEBATA BEŞIKÇI YA DEWRA DUYEMİN

- 1 - Rêveçûna Zanînê: Ev pirtûk û pitûkên wî bin çewtiyêñ pirtûka "Saziya Rojhilata Anadoliyê" ji navê radike. Rêveçûna Zanînê û Birûbaweriya Kemalizmê

tîne ber çav.

2 - Zordariya İslâkîriya Kurdan: Bi tevayî birûbaweriya Kemalizmê dide ber çav û tevgera wî ya nû û partiya Cumhuriyeta Gel (CHP) nişan dide.

3 - "Teza Dîroka Tirk", Teoriya Ziman-Roj" û "Pirsîn Kurd", ev xebat di sala 1930 an de li ser ziman û dîroka tîrkan hatiye kîrin. Çewtiyêñ wê berçav dike.

4 - Destûra Hêza Gelê Komarî (Cumhuriyet Halk Fırkası) 1927 û Pirsîn kurd. Ev pirtûk, dema yek partî û yek seroketi bi dokumenten rêzânî rewşê diyar dike.

Ev pirtûken ku ji aliyê Beşikçi ve hati bûne nîvisandin û teslimê Çapxana Komal kiri bû; lê belê hezar mixabin Komal mecal nedît ku wan bide çapê. Lê, iro li Ewrupayê dê Dengê Komal, vî kari pêk bîne.

1 - Qanûna Tunçeliyê, 1937 û Jenosîda Dîrîsimê (1937-1938), ev pirtûk kîrinê tîrkan yê 1937-38 bi rengelî dokumenter û rêzânî tîne berçav

2 - Qetliama Özalpê, bûyera 33 berikan, dema serokatiya netewiya İranî de bi finforekên muxiali, 33 kurd di sînoren İranê de hati bûn qetil kîrin.

3 - Programa Hêza Gela Komarî (CHF) derçûyina programma hêza gel a Komarî û gîzdiriya kolonikirina Kurdistanê tîne berçav.

4 - Li ser kurdistanê parvekirineki İmperyalist û Lozan Di navbera salêñ 1917-1922 an de bûyerên ku li Lozanê hatiye kîrin û rêz bûye.

Wî di pirtûka xwe de naskirina Kemalizmê û bingeha kolonikirina Kurdistanê baş dide zelalkirin.

Ev pirtûken ku ji aliyê Dengê Komal li Ewrupayê hatîne çapkirin:

1 - Parastin : Ew di wê pirtûka xwe de parastina mafê ziman-çand û seneta netewa kurd ji ber dadgeha tîrkan diket.

2 - Beşikçi, di vê nama xwe de li Rêxistina UNECO rexne digre; ji ber ku UNECO bîryar dabû, ku "Mustafa Kemal miroveki pêşverû û demokrat bû" Beşikçi di vê nama xwe de bi şêwekî zanîstî û berçav nijadperestî û diktatorya Mustafa Kemal dide zanîn û diyar kîrin. Beşikçi, vê nama xwe di girtixana kolîyalistên tîr de nîvisandi bû. Ü bi dîzî nushek ji Rêxistina UNECO re şandi bû. Foto kopya vê nama ha li girtixanê hat girtin. Kolonîyalistên tîr, ji bo vê nama ha 10 sal cezayêñ giran dan Beşikçi. Beşikçi niha cezayê vê nama ha dikşîne.

### WESYETNAMA H. HIŞYAR

#### NIVISAR EV IN:

- 1 - 5 Cild tarîxa Kurd (Ji 8000 sal berî za heyanî qîrnê 19 an)
- 2 - 5 Cild Dîtin û Bîrhatiyê Min (ji 1914-1984 bi xwe dîgrin)
- 3 - Diwanek Şûران (Melzûm û Înşâî ne, tebiet mewzûnî, lê arûzî ne)
- 4 - Zerdeş û Noroz-Bûza û Konfîyos
- 5 - Felsefa Xebata Welat (Jê re hînek teshîh divê)
- 6 - Gazi û Hawara Navbera Zagros û Zara (kirasekî ye)
- 7 - Erûda Kurdi (ji bo şîran)

8 - Nozde jîmarêñ Kovara Agahî (ew ji dîbin cildek)

9 - Deh Muzakeratêñ ku Min Dane Şoreşa İraqê (ew ji dîbin cildek)

10 - Muzakeratêñ Qedî Beg (min wergerandiye zimanê kurdî)

11 - Hijde Deste Şoreşa Şex Seid û Ararat (ji ber ku hin deste jê winda bûn, di cîldê pêşîn muzakeratêñ min de hatiye derbaskirin)

#### WESYETA MIRINA MIN

Eger li van hawiran mirim, divê min li Dogirê vesêrin. Eger ji we ne

qedîya ji' qet ne be li kevira ber serê min nav tarîxa zayîndê (1907) tevî a mirinê binîvisin. Ji bo dema Kurdistanâ Bakûr rizgar bû, hunê hestiyêñ min bibin Serdê, li rix bavê min vesêrin. Vê wesiye li kurêñ xwe ji bikin.

Bavê we Hesen Hişyar Serdi  
25 Hezîran 1984

Kurêñ min, divê hun zanibin ku di mulkiyeta van kitêban de keçen min ji pardar in, bi we re ne. Ku hun bêjin wesyet bi vê me ye, no,

## WESYETNAMA MELLE HESENE HISYAR

25. Hezîran. 1984

## KURÊN MIN, ÇAVÊN MIN!

Bi dilovaniya bavîti ji bo we ji yînek bextiyarî, rojîn xweş û ges her daxwaza dilê min bûn. Lî armanca min a nîştimanperweriya siyasi di madî de hun negîhandin wê jiyîna gesî û xweşî ku ez ji bi we re. Çawa ku însan bê xeta nabe di warê civatiya malê de ji nabe ku xeleten min tunebin, tevaya wan xeletan atîfî, lê ne qestî bûne.

Ji milê din, dewleten Kurdistan ên dijûn û çepel, li pit wan mesâlîhîn dewleten çep û rast di her zirûfen zaman û mekan de ne hishtine û nahêlin ku em ji wek nîjadîn chhanê di welatê xwe de bi Yekîtiya malbatî û nîjadî bi dilgesî bijîn, çawa ku 50 sal ji tarixa vê nîvisarê vir ve di nav hêlîn xeribiyê de ser û binê hev dibim. (ji 27 salen serpêhatî û feleketen di welat de ji desten tirkên Mongol pê ve.)

Lê wan girftariyên jiyinê ji awan bi awakî armanca min a nîştimanperwerî nikeribûye sar bike, çawa ku ji xebatîn min xuya dike. Lewre ew dîlî, bindestî û stemberiya nîjadî min li ber çavê min bûn. Nemaze ji 1975 ve ku dewleten Kurdistan vegirtî û daxwazên diweli miletê me kiribû wek eflamên kertonî bi 35 navan partî dabûne çêkirin û bera pêşîra hev û milet dabûn. ji her zamanan zêdetir ez pê dişiyam. Wan dijwariyên mezîn ji jîndariya min û wê zêdetir bikana dil û heşê min agir vedidan çawa ku berê ji, ji dêla ku ji bona jiyina tekane li pere û mal biggerin, her û her li mesadîren tarîxan digeriyam ku ji min re bûbûn nexweşiyek rûhî û ez dihêjandim. Sebebîn mezîn ji belengaziya min û we ew bûn!

Di exlaq, armanca û edeba şexsi de bawer im ku li ber min keremeta xwe û we parastiye çawa ku di vi warî de hun ji bi jiyîna min re hevbar bûn û vê rastiyê dizanîn. Ji ber wê çendê bawerim ku hunê ne tenê madî, lê di van milkiyeten nîvisarê min de xwe bextiyar û serifraz bibînin. Nemaze di çapkirin û de hunê bibînin ku di nîvisandina tarîxa miletê xwe de min ci zehmet dîne û ci zehmet kirine.

Lewre dema min raheştiye xama xwe, min bê dilreşî û meyildarî merkeza xwe exlaq û mentiqâ tarîxê parastiye. Her bûyeren zaman û mekan bi awakî rast û durist nîvisîne. Ji ber ku exlaqê ilmî, edeba tarîxê û huquqê milet di ser her tişti re ye, çawa ku hunê di "Dîtin Û Bîrhatiyen Min" de qenc agahdar bibin ku di jiyîna xwe ya bêbext de dê bê min ci felaket dîtine. Di wan serpêhatiyen mezîn de min bê sekîn her tevger û serpêhatiyen miletê xwe û stember berhev kirine da ku bi zincîra tarîxê ve bêne girêdan. Lê sed mixabin, stemkariyên zaman rî ne dan ku di saxiya xwe de wan xizmeten xwe bidim çapkirin û belavkirin. Ew keser bi min re ke te bin axa sar û bêdeng! Lê bawerîya min xurt e ku hunê zirûfan bi dest xin, wê daxwaza min bi cih bînin.

Tenê hêviya min ji ew e ku hunê ji îhtîrama bavetiyê pê ve di exlaq û edeba tarîxê de huquqê min û milet di ser her awirîn siyasi û dilbijokiyen a ideoloji û programen partiyan re bigrin. Her weki;

Çima ji tarîxê re tê gotin muqedes? Ji ber ku salix ji wan însanen zemanen bûriyên dûr ve dide, her tevgeren jiyîn û serpêhatiyen wan bi wi zeman û meknî ve girêdayî bi xwe digre, wê rewş û her awayen wan ên civatî, aborî, dezgedarî, zanistî û siyasi ku ji wan bi sun de wek; Sî an reça wana mayî di zemanî fro de ji me re di de derpêskirin, ku ji muerix re muhendisê zeman û fenan tê gotin û ji parastina mentiqâ tarîxê re pîroz tê gotin.

Bi vê agahiyê divê em zanibin; dema ku bixwazin zanibin ku tarîx ne pêrgirtiyê nîzam û qanûnen dewletan e. Wiha reng e ne pêrgirtiyê programen partiyen çep û rast û ne ji bi felsefe ên rûnî û madî ve ji girêdayî ye. Ji ber ku ew tev de li ber mirêka tarîxê ne. Ne tarîx ji ronahiya wan pêktê, no. Felsefe di teceriban de xwe di tarîxê digre. Em siya tarîxê û tarîx siya zeman e. Ew zemanê ku ji xwe ye, bi xwe ye û li xwe ye. Her peyda ji zeman in li zeman her ji xwe ye, jê re pêsi

û dawî nîne, hertiçji wê ne û pê ve ne. Bê zeman ilmî flekiyat, riyaziyat û fizîa ji nikare qîyas û nispet bigire.

Bi van danezanen jor, daxwaz û wesyeta min li we ev e ku di çapkirin de, li gor dawazên xwe an ên hînan tiştekî jê kêm û zêde ne kin. Ji ber ku ez bi wan mesûl im, ne hun. Lewre ci nîvisarê ku bi zeman, mekan û waqîf bin, ji wan re ilmî tê gotin. Kesê înkara ilim bike, ew kes înkara nefsa xwe dike, ji bê exlaq û nunehkariyê pê ve, berî çapkirinê hin parçê jê nayen dayin. Lewre hînhê nayen zanîn ku kê ji kê girtiye. ev tev de ji bo ew ne û mulkiyete we ne.

**KURÊN MIN:** Di warên siyasi de bi mezheran me xapin, piştî ku we tevaya muzakeratên min xwendin, hînpê bawer im ku hunê nas bikin ku ew destûren semawi, felsefe ên zemanî, wesîke ên huquqê însan tev de xwemal in, yanî ji xwendiyen xwe re muemen in. Tenê li kamûsan tene dîtin. Heq li ba quwetê ye, ne zêde ew quwet ji bi yekîtiya milet ve girêdayî ye, ne bi bir û şan bi wê gumana quwetê ye ku însan ji xudanek ne senî re şer di dewînin. Ji milê din divê pir û hindik hun zanibin di navbera Qafqas, Derya Spî û Xelîç, di navbera Ewrûpa û Hindistan de li ser stratejiya leşker gehin şerq û xerb cografya Kurdistan ci ehmiyeteş siyasi, aborî û eskerî bi xwe digre. Hêj hunê zanibin ku bê muxetetên siyasi yekîti, ixlas, zanîn û fedekarı bi vê gula began tiştek bi dest nakeve, her weki emsîla me kurdan dibêjin; bi xweziyan dest nagîje baqê keziyan û heq girtin e, ne xwestin û ne ji kesê daye kesê.

## DANEZANEK JI NIVISAREN MIN

Her cîldek du nusxe ne.....

Li her cîldî kilîşa min dikeve dwiyya pêşgotinê. Li bin resim ev tê nîvisandin: Ez çûm ev kilîş dimîne/ ev e jiyîn li rû zemîn e.

CİMA HELBESTEN MIN NE EVİNİ

Di bihara umir de min dilgesi ne diye  
 Di bin perda sitem de qiriftdarî her diye  
 Di bihuşa Kurdistan baxê îrem ne diye  
 Wan suriştên sor û zer awir li min ne dave  
 Di dûjeha Mengoli di nav aqîr veşanî  
 Bi êş û derd û kovan bextiyarî ne diye  
 Nefî, zindan û xurbet li min her bûn edet  
 Kêf û xwesi min ne dît para min ev ketiye  
 Di bin top û firindan welat miş û dûxan e  
 Gulzar û bax û bûstan ariya reş xuya ne  
 Denqê şalûl û bilbil ne ma li ser zinaran  
 Li kavilên xirabe kundê çepel xuya ye  
 Warê Zînê ji xwînê bi rengê sor vedaye  
 Li ser laşê kuştıyan ala me sî vedaye  
 Li şikeft û newalan jîn k zarok birîndar  
 Bê derman û birçî ne heq û însaf li ku ye  
 Di wê jîna qiriftar bi gazi k hewar in  
 Dengê wan qet nayê me gelo Swêd li ku ye  
 'î Kurdistan dûrketi ji hev bûne qet-qeti  
 Bê yekîti bi armanc kê mafê xwe qirtiye  
 Maf qirtine ne xwestin ne qotinê hevalan  
 Nejadê me stember çavnêrê zendê we ye  
 Xwe dibînin partîzan cîma nabin şoresvan  
 Rêwingiyêñ bê quman qonaza we li ku ye  
 Tev zbit in bê neter bê top û tanq û leşker  
 Eniya şer li ku ye hêviya we bi ci ye  
 Bê zanîn û felsefe milet ji we diwîse  
 Hûn ji me ne bi me ne cih û warê me ku ye  
 Het nejadî bi xortan havîl bi dest xistine  
 C. a bextû me reş e di we hêvi ne diye  
 Zarok li xwe şîyar bin li cihanê binîhîrin  
 Nescî wek me dîl û jar welê bindest ne maye

Hesen HİSYAR

22.Adar.1985/Qamusî

NUROJ

Nûroz e xwes nûroz e  
 Ser sala nû pîroz e  
 Doza mafê qelê me ye  
 Navdarî û qedê me ye  
 Gawe hesinkarê Kurd e  
 Ferîdûn dûnde ê zend e  
 Agir pêtî ronahî ve  
 Ji dîliyê rizgari ve  
 Tarîxa me cengaweri  
 Zimanê me palî k derî  
 Lemma koka Arî em in  
 Em xwediye cama cem in  
 Em arî ne xawerî ne  
 Bawermendê Zerdeşti ne  
 Kurên Mad û Mîtanî ne  
 Hûrî, Kasî, îlamî ne  
 Abram û Hoşenâ ji me ne  
 Nemrûd û Azer ên me ne  
 Eshabî, Kaf, Hûrî pêş in  
 Sara İsmâîl ii qos in  
 Ew berê reş Medanî ve  
 Peresygaha islamî ye  
 Lolo, Godî navî me ye  
 Nûh bi xwe bay pîrê me ye  
 Fermandarî û serdarî  
 Em bûn nejadê xawerî  
 Divê iro me yek rîber  
 Vejîne nû rozek nûder

Hesen HİSYAR

# ÇEND NAME Ú PİROZNAME

## NANEYEK Jİ SILÊMANIYÊ

Xwendevanên heja;

Ev nameye kurdeki ji Sileymaniyê bo hinde hevalên xwe li Swêdê sandiyê û basê rewşa Silêmaniye û hovitiya rijêm a faşista Eraqê dikit. Me ew name bê gohartin wergerandiye diyalêkta kurmanciya jorî, lê ji hejî gotinê ye ku hinde nav têda hebûn, me ew nav jê birîne.


Hevalên xwestivî

Ev demê hewe baş... silav û rêzân min bo hewe.

Hevalan....

Rewşa min baş e.. ez hîvîdikim ku rewşa hewe jî baş bit. Lê ew buyerên van roja li Silêmaniye rûdayn, hêsta di diroka jin a xwe da min teşê wilo ne ditiye Spêdeya roja 17.X.1985 hêzeka mezinji leşkerê li nav bajêri belav bûn ji seet 5 ta 6, bi balefira li nav taxên bajêri di geryan û di gotin 'ey xelkê vî bajêrî rê bidin van hevwelatiya' bêne nav malên hewe û li nav malên hewe bigerin, mebest ji 'hevwelatiya' hezên leşkeri bûn yên ku beri roja 17.X.1985 bi çend rojeka hatibûn û her çar dewrên bajêrî girtibûn. Ev hêze ji gelek bajarên din hatibûn wek Bexda Mûsil, Hewlîr, Zaxo, Dihok, Omare, Kerbe-la.....hdw. Helbet dema xelk di pirsîn ev leşkere dê çixê çwarte û li wir şere, lê dawiyê bo xelki derket ku ev direw û xapandin bû.

Her li wî demi yê ku xelk agehdarkirî ku qedexeye ji malên xwe derkevin, edî weki dehbe û dirindeyêن ji qetesa derketin, leşker kete nav xelkê bêgonehê bajêrî. Tiştê heri giring li cem wan



yên qedexe. Ev malên sloganên diji rijêmê li ser diwarên wan hatine nivisandin, du şev û du roja xistine zindanê. Kes nizanit rewşa bajêri ci lêhati bû. Pişti mal teftişkirin her maleka kitêbek yan belavokek xêda ditin, bîldozer dayê û herifandin û xwediyyen wê xistine zindanê. (eve min bi çavêñ xwe dit malek di bin mala me da jiber kitbeqa Markisi û yeka Lenîni, bîldozer da xaniyê wan û ew ji xistine zindanê. ne tenê ev malek lê gelek malên din ji, ya ji vê nexwestir ew bû kû pêtir li wan mala digeryan bêñ kû yek ji wê male pêşmerge yan ji eskeriyê bazzabit yan çek û tiştê din têda ban. Hejmarek mezin ji firarên eskeriyê wê rojê girtin.)

- Hejmara wan ji 30 hizar serbaz û leşkerê 'millî pêtir bûn, weki xelkî bas dikir...
- Yek ji wana dayik û bavê...bûn, lê zû hatin berdan û ne ketibûn ber eşkencê. Gelek firar wê rojê kuştin.

ev bûn..mirovêñ ji eskeryê bazdayn, peşmerge, çek, belavokêñ partiya, kitabêñ Markisis û wêne

### GELE ME TOLA XWE DİGRE

Di hejmara Berbangê ya 6/85 an de me nivisarek belav kiri bû li ser tawanâ bêbexta rejîma faşist a Saddamî, dijî ordugahê ZEWË!

Deng û bahs ji welatî hatin ku çend peşmergekêñ nav bajêra karîn sizayê gel bi cih bînin li ser yek ji wan balafirvanen ZEWË bombabarân kirin û li ber deriyê xaniyê vî kuştin.

Berî demekî, gernasen gelê me du balefirvan li bajêre Silêmaniye jî kuştî bûn. Bila dijminê me baş bîzanîn ku bîhayê xwîna zarokêñ ZEWË dê giran bide!

## JI REDAKSIYONA BERBANGÊ RE

Hejmara Berbangê ya 5/85 an ji derket. Berbang, hejmar bi hejmar baştır dibe û ji aliyê naverokê ve ji dewlemendir dibe. Meriv wek kurdeki xwe serbilind dibine, ku kovar, lîteratûr û zimanê kurdi pêşve diçe û zede dibe! Xwendevanê kurd ên deren welat, ji hindikayî ve dikarin êdi pirtükêkê, kovarekê û yan ji broşürekê bigrin destê xwe û şanî biyaniyekî ( tirkekî, erebekî, swêdî-yekî...) bidin û bidin qebûl kirin, ku ew ji wek gelên din ê dinê xwedîyi ziman û kulturekê ne. Ev bûyinê han tevde wek min li jor ji got; pêşveçûne, xebat e, yekîti ye û serbilidayî ye.

Lê belê em kurd tevde şasîti û nezanîyan ji dikin. Ew tişt wek ku pêşyîyen me gotine " heta em birhê rast dikin, çav pê re derdixin." Ev şasîtiyê me, ne iro û ne ji doh dest-pêkirine. Lâ, ez dikim, nakim nikarim fêhm bikim bê çîma em nikarin li ser tiştekî biçuk li hev bikin û pêkenîna gelên Dinê ji ser xwe rakin. Ev ji mesela tîpen latîni û bikaranîna wan e; di zimanê nivîse de....

Ez, li dibistanê swêdi mamostetiya zimanê kurdi (kurmancî) dikim. Wek min didestpêkê de ji got, ez bi pirbûna kovar û pirtûkan pirr kîfxwes im û di desten min de bêtir malzeme hene. Lâ gelo, ez ê li pey şopa kê herim û li tîpe kê kovarêkê bikar bînim? Ez ê li hemberê şagirtên xwe ci bêjim, ku baweriya wan bi min bê? ... Ev ji mesela tîpen latîni ye. Gelo ez ê wek kê van tîpan bidim naskirinê? Ev çend nimûne ne li jêr:

Berbang: "I" û "i" bikar tîne.

Institûya Kurd: "i" û "i"

Qanatê Kurdo wek institûye,

Borzaslan: Wek

Cigerxwîn: "

Meriv dikare nimûnan pir bike. Mêzeke û bibîne, ku piraniya nivîskarêkê kurd û xwendevanê kurd "i" û "i" bikar tînin û tenê ji a xwe nayîn xwarê, bi şiklekê din dinivîsinin. Yek ji wan ji Berbang e. Dibe ku dîtina wan rastir be ji, lê ji bo yekîtiyek çêbibe, pêşveçûnek çêbibe û lîteratûra me dewlemend bibe; divê em dev ji vê serhişkîtiyê berdin. peyçûna me tevde li ser kumukekî û noqtekê ye.

Lo qey ma wê ci bibe ku em li hev rûnîn û ya xwe bikin yek. Em ê bê, ji nûvre û bila bi tîpen ÇİNÎ kurdi bê nivîsandin. Ma Dinya xerab nabe!!! Hin bi kîrîlîkî, hin bi erebî, hin bi tirkî û hinek ji dibêjin "em bi latîni binivîsinin" û serhişkî berdewam e. Bi rastî ev ji wek piraniya parçeyêne me yêni siyasi û dîtinêne me yêni li ser azadiya Kurdistanê ku her yekîti diji yê din e û kîfe dijmin pirr tîne.

Li vi welatê demokratik (Swêdî) mafê xwendin û nivîsandinê bi zimanê me yê zikmaki didin me û maaşê mamosten me didin; lê em ji xwe fedî dikin û roj bi roj zarokên me êdi hew baweriye bi me û gotinêne me tînin. Dev ji me û kurditiya me û Kurdistanê berdidin, dibin swêdi û tîstên din.

Li dawi ez dibêjim; "êdi şerm e, bes e... Tev li rûyekî û bi careki tîpan binivîsinin. Yan ji dev ji xwe berdin, bibin ereb, ecem û tirk. E wan yek alfabya wan heye û mîletê wan zanin ci dixwîmin.

Bi silavêni dostaniyê û bi hêviya yekîtiyê...

Bareş Battê

## PIROZBAHIYA SALA NÛ

Xwendevanê hêja!

Em sala we ya nû pîroz dikin! Ji we hemû xwendevanêne xwe yêni giranbaha re saleke dilşahî û serbilindî dixwazin!

Daxwaza me ew e, ku neteweyê kurd, di sala 1986 an de li dij dewletên kolonîyalist û nîjadperest hîn bêtir tekoşineke bêwestan û bêhempa bide. Ber bi yekîtiyê ve gav bavêje. Bi ber serketin û serfiraziyê ve bimeş!

BERBANG

## ÇEND PIROZNAMEYÊN KU JI BERBANGÊ RE HATINE

## JI HEMÛ HEVALÊN REDAKSIYONA BERBANGÊ RE

Ez bi dil ûcan sala we ya nû, ya 1986 an pîroz dikim û serfiraziya we dixwazim! Silavêni biratî û şoreşgerî ji we hemûyan re rîdikim!

R. Çolpan  
Avustraliya

## JI REDAKSIYONA BERBANGÊ RE

Her hejmara "Berbang" ji yêni berê baştır ( ji aliyê metod û teknikî ) û demokratir dibe. Yani cî dabûna bîr û baweriyeen an ji dîtinêni ji hev cûdatir, rengeki pir xweşik û hêviyêne pozitif dide merov. Ji ber vê yekê em spas dikin; ji bo wî karê ( ku ez dizanîm çiqası zor û zahmeten we hene) hun dikin.

Sersala we tevan pîroz be! Hêvi ew e, ku sala 86 an ji me re saleke bi şans be! Silav!

K. G.

## JI BERBANGÊ RE

Çend hejmaren Berbang, bi rîk û pêk ketin desten min. Min spasdar im. Hêviya min ew e, ku wilo dom bike. Her ku diçe, ji alf naverok û şêwe ve ji baş dibe. Li gor min Berbang hîn bûye kovareke demokratî û Kurdistanî.

Sala we ya nû pîroz dikim û ji we re serkeftin dixwizim! Bi silavêni welatparêzi!

M. Şengalî  
Elmanya Roava

# ji , mîrkut' re mîkutek

Bi rastî me geleki dixwest di nav çend peyvîn li ser nîvisandina Berbangê qerfekê bibinîn, lê mixabin tiştekî wiha me nedît.

Em dibêjin mixabin, lewra "Mîrkut" bi çewti qerf û mîzahê bi me dide naskirin... Ma gelo mîzah ci ye û ji kîjan zimanî hatiye?

Em bi xwe ne dijî gotinêni biyani di zimanê kurdî de ne, lê em dijî wan peyvîn, ku dikevin şûna bêjeyen bav

û kalan in. Bi xwe em famnakîn çîma kurdêne Kurdistana Bakûr di şûna tîrsê xof a erebî bi cîk tînin. Wiha ji di şûna bêjeyâ kurdî mîrxas cesaretê bi kartinîn.

Emê vejerin ser peyva mîzahê. Herçî mîzah bêjeyek erebî ye û gotina henek a kurdî şûna wê digre... Ereb bi xwe vê peyvê di nîvisandînen xwe de bi kar naynin, ma çîma emê wê bi kar binin?

Eger berpirsiyarê Mîrkut çewtiyek din nekiriba, wê ne hewceyê nîvisandinê ba. Raste. Mîzah û qerf ne yekin. Lê hîç ne bi wê mana, ku di Mîrkut de hatiye. Di vir de, pêwîste em vejerin tirminêni latîni. Herweki em zanîn, ku ewrûpiyan bê sinor bêjeyen latîni xistine zimanêni xwe. Helbet roja iro, duriste di warê zanistî, edebî, û felsefi de em ji bêjeyen latîni bi cîk binin.

Wek ku em zanîn, di warê henek pêkirinê de pir peyv hene. Di latîni de emê du bêjeyan bidin aliki: "Hommor" û "satura". Rûberî wan bi kurdi ev peyvin: "Henek" û "qerf" e. Di zimanê ewrûpiyan de pêkenînen Satîre ji yê humerê tûjtire. Wiha ji bi kurdî henek û pêkenînen wê sifiktire ji yê qerfan.

Ji rexen din ve em famnakîn, çîma Mîrkut qerfa tenê bi mana negatîf

dide xwuya kirin. Ma henekîn "homor" ne bi mana negatîf? Ma gelo henek û qerf ne ji bo rexnan li diyardeyên (zahire) çewt di jîyana me de bikin nine?

Peyva me ya dawî ji berpirsiyarê Mîrkutê re ev e: Ma navê "Mîrkut" ne çewte? Da ku em nasbikin çîma ev peyv şase, divê em vejerin jêdera vê gotinê. Mîrkut ji du peyvan hatiye; Mîr û kut, yanî mîr dikute. Di zimanê kurdî de peyvîn wiha pîrin. Em dibêjin pîsmam tevî ku eslê vê gotinê ji piser û am hatiye. Lê roja iro ev gotin sivik bûye mina "mîrkut" şûna "mîrkut" pîsmam ji şûna "pisar" û "am". Wilo ji gotina dotmam eslê vê bêjeyê dotir ame. Em heya sibehê karin peyvîn wiha ku hatine guhartin em binin.

Em hêvidarin, ku "Mîrkut" wê xwe nexeydîne û bi çewti nema "Mîrkuta" bavê je Berbangê!

## min hîn xatir

## ji welat ne xwestiye

Beyanya yeksemîyê, mina hercav Dr. Alan cû goristana bajare Ziwirix û bi dilovanî gurzik gul danî ser tirba mermerî, ya ku pîreka wî Rinda serê xwe bêpêjin danîye. Dr. Alan axînek bi xemgîn berda tu dibê qey xem û kulê xwe pere berdide. Mîna hercav ji Alan bi dengeki bilind bi jîna xwe re axîv! Hê Rinda min, te çiqasî tade li xwe û me kir! Te em li vê xerftiyê hiştin û tu nema bendî roja vegera Roja hatina gundê me yê bi bergehîn xwe nu spehî. Divya bû tu vegriya nav axa welat û li wira te mijankêni. xwe berdena ser hinarkê ruyê xwe..Divyabû tubihati-

na nixumandin bi kulfîkîn mîr-gêne Hekarya.. Ez û keça me, bendî rabûna te ji nexweşiyê kû da-kî tu çavêni xwe kilbike bi xwe-liya welat. Lê te tiştek ji me re nehişt, ji bîranînen tal û tîrs pêve.

Sirek bayê bakûr rabû, bû xişxişa pelêni ku ji daran têni weşan-din dawiya eylülê ket. Mîna rew-rewkê dêmê Rinda li ber mîrinê hate ber çavêni wî. Bi destê xwe yê çepê çavêni xwe girtin li ser çend dilopân hêşiran.. Alan nema xwe girt daqulhat li ser quçê tirbê û bi dilovanî ew hembêz kir, mina ku Rinda di nav destê wî de bû... Kevirê tirbê maçî kir, porê xwenî sipî pê bûr û anî û di ber

xwe de got : Xwedêyo ! Çiqasî zore... Çiqasî Rinda min tu delal û şirinî. Ü çiqasî tu comerdî, heger te Perwin ji min re nehiştâ ba minê çawa bikra

Alan keserek dirêj berda, bi dîjwarî xwîzka xwe daqurtand, bi çavêni mişt hê sir li esimana nerf û bi dengeki kelugîrî got: Rinda min li min negir.. Divê ez dej te berdim, sibe ez vedigerim welat.. Erê Rinda min ez bi keça me Perwinê sibe vedigerin welat.... Pir me dixwest tu bi mîre vejeriya... Lê emê çibkin... Destê me ji te nabe, û li gora qewlîya te (divê em vejerin.. Erê emê vejerin, lewra min ji hîn xetir ji welat nexwestiye...



# mizgîniyek



Înstituya Swêdê ya agahdariya metaryalên perwerdekariyê (SIL), di derheqê çapkirin û weşandina çend pirtûkên kurdî (kurdiya Bakûr) de belavokek belav kir. Ev sazgeha Swêdî, di belevoka xwe ya agahdariyê de diyar dike, ku heta sala nû (1986) dê sazgeh, ji bo şagirtên kurdan çend pirtûkên kurdî biweşîne.

Sazgeha metaryalan a swêdî SIL ji bo zarakên kurdan yêñ dibistana yekemin niha 4 pirtûkên cûrbe-cûr daye çapê. Ev pirtûkên ku di çapê de ne ev in:

- \* Pirtûka xwendinê (navê pirtûkê Embixwînin e û ji bo sinifa 1-2 an e.)
- \* Pirtûka xebatê (ev pirtûk girêdayîyê ya Embixwînin e.)
- \* Pirtûka Leystik û lihevhatiyên kurdî (kurdi-swêdî)
- \* Pirtûka Çirokêñ kurdî ( kurdî-swêdî)

Mirov ji niha ve kare van her çar pirtûkan ji navnişanaçpxanê bixwaze.

Ji bil van her çar pirtûkan, Înstitûyê ji bo sinifên bilind ji program û plana pirtûk û metaryalên kurdî çêkirî ye. Û Înstituya metaryalan, di vî warî de ji, di belavoka xwe de wiha dinivîsîne:

\* Ji bo sinifên biçûk û kesen mezin yêñ nexwendî çapkirina metaryalên kurdî dom dike.

\* Ji bo sinifên bilind, plana antolojiyek hatîye çêkirin.

\* Xebata ferhenga swêdî- kurdî ( kurdiya Bakûr) berdewam e.

Înstituya metaryalan, di agahdariya xwe de dide diyar kirin, ku ji bo kurdiya Başûr (soranî) ji, tevdîla pirtûk û metaryalan dike.

Me, belavoka Înstitûyê biçûk kir û orjinala wê di vê rûpelê de diweşînin. Ew kesen ku bixwazin van pirtûkan bi destê xwe xin, karin ji niha ve ji navnişana çapxanê bixwazin. Navnişana çapxanê ev e:

RPH - HÖR, BOX 3083, 700 03 ÖREBRO



Det gläst streckade området representerar en minimiuppskattning av Kurdistans utbredning. Det lått streckade området är en maximiuuppskattning baserad på 1948 års kurdiska territoriella krav.

(ur Åler Kuutman: Om Kurder. SIV 1983)

## KURDISKA LÄROMEDEL

Till för något år sedan kom huvuddelen av kurdiska barnfamiljer i Sverige från Turkiet, i mindre omfattning från Syrien och Irak. Det språk som talas i dessa familjer är till övervägande del nordkurdiska, i Sverige ofta benämnd kurmanji.

Med den senaste tidens flyktinginvandring har också kurdiska familjer från Irak sökt sig till Sverige i stort antal. Det betyder att antalet barn och ungdomar med behov av undervisning i sydkurdiska, i Sverige också benämnd sorani, har ökat snabbt.

## Läromedel på nordkurdiska

Följande material kommer att produceras av SIL under detta läsår:

- |  |                                    |
|--|------------------------------------|
| • Kurdisk läslära                                  | kan beställas från den 1 nov 1985. |
| • Arbetsbok till kurdisk läslära                   | beräknas klar i januari 1986.      |
| • Kurdiska lekar och ramsor (kurdiska och svenska) | beräknas klar i januari 1986.      |
| • Kurdiska sager (kurdiska och svenska)            | beräknas klar i januari 1986.      |

Utveckling pågår av ett LTG-material (lägstadiel och grundvux).

En antologi för högstadiet är under planering.

I LEXIN-projektet utarbetas ett svenskt-nordkurdiskt minilexikon.

För att ge kommunerna överblick över nordkurdiskt material som är lämpligt att använda i undervisningen och som kan köpas i Sverige eller Västeuropa, läter SIL sammanställa en litteraturlista. Den bör vara klar i november.

## Läromedel på sydkurdiska

SIL undersöker möjligheten att få fram läromedel för undervisning i sydkurdiska. Vi återkommer senare med information.

Nedanstående beställning tar RPH-HÖR emot från den 1 november 1985.

RPH-HÖR, Box 3083, 700 03 ÖREBRO

Beställning: .... ex 0464-5 Kurdisk läsebok (nordkurdiska) à 48 kr + moms.

Beställare: .....

Leveransadress: .....


Underskrift: .....

ADRESS/NAVNIŞAN:  
RISSNELEDEN 55,NB  
172 44 SUNDBYBERG/SWEDEN

# ŞEVA BERBANG ê

KURDISK

KULTUR  
AFTON



## Program

\* CWAN HACO

\* TEMO

\* FOLKLOR

\* MUSABAQA ZAROKAN

FOLKETHUS

11-01- 1986

kl. 15<sup>30</sup>—21<sup>00</sup>

KURDISKA RIKSFÖRBUNDET  
FEDERASYONA KOMELÊN KURDISTANÊ LI SWËD